# Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1395 | 19-Tîrmeh-2026 | www.ronahi.net/ku/



**Navnîşan**
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218


# Gaziyên Şer: Em dest ji destkeftiyên xwe bernadin

**Solîn Mihemed / Qamişlo**

**Gaziyên Şer diyar kirin ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji bo Rojavayê Kurdistanê wergerekî dîrokî ye û destnîşan kirin ku ev şoreş bi xwîna şehîdan, fedakariya canfîdayan û keda birîndaran hatiye avakirin.**

Şoreşa 19'ê Tîrmehê di nava 14 salên derbasbûyî de, ji hêla dewletên dagirker, komên girêdayî wan û çeteyên DAIŞ'ê ve rastî gelek êrîşên dijwar hat. Lê belê şervanên azadiyê li hemberî van êrîşan bi îradeyeke mezin li ber xwe dan. Ji bo avakirin, parastin û pêşxistina şoreşê, bi hezaran şervanên jin û mêr şehîd û birîndar bûn.
Îro 14 sal di ser vê şoreşa gelan ku li Rojavayê Kurdistanê dest pê kir re derbas dibin. Di derbarê mijarê de gaziyên şer Şêrzad


Şêrzad Resûl


Seîd Ismaîl

Resûl û Seîd Ismaîl ji rojnameya me re axivîn.

**'19'ê Tîrmehê ji bo me xwedî wateyeke mezin e'**

Şêrzad Resûl bal kişand ser girîngiya dîrokî ya vê rojê û weha got: "Şoreşa 19'ê Tîrmehê bi hêsanî pêknehat, lê belê bi keda bi hezaran şehîdan hat afirandin. Em wek gaziyên şer, mîsyona wan şehîdan di kesayetiya xwe de dibînin. Ji bo wê yekê, divê em bi hemû şêwazan van destkeftiyan biparêzin. Parastin tenê ne hildana çekan e; weke gazî, erka me ye ku em xwe di warê rêxistinî de dewlemend bikin û di nava gel de sîstema rêxistinbûnê ya ku bingehê civakê ye zindî bikin."
Şêrzad di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser şerê taybet û wiha pê de çû: "Em dibînin ka çawa li dijî vê şoreşê propagandayên reşkirinê tên meşandin û dixwazin van destkeftiyan pûç bikin. Ji bo vê yekê, pûçkirina van propagandayên şerê taybet erka me hemûyan e."

**'Roja 19'ê Tîrmehê ji bo Kurdan rojeke dîrokî ye'**

Seîd Ismaîl Jî anî ziman ku ev şoreş li Rojhilata Navîn bû tecrûbeyeke bêhempa û ji hemû cîhanê re bû mînak û wiha got: "Zilm, zordarî û koletiya bi sedsalan a li ser jinê hat hilweşandin. Jin bû pêşeng û rêvebira civaka demokratîk. Sîstema hevserokatiyê cihê xwe girt û bi vî rengî nîvê din ê civakê ku hatibû felckirin, dîsa zindî bû."
Ismaîl diyar kir ku şoreşa ku ji Kobanê dest pê kir, sînorên herêmê derbas kirin û wiha domand: "Şoreşê seranserî Rojava girt, gihîşt Tebqa û Dêrezorê; hemû ol û netewe di bin sîwana Netewa Demokratîk de anîn cem hev û yekîtiyeke li ser bingeha edalet û wekheviyê ava kir. Tu gotin û têgîn têrê nakin ku wateya rastî ya Şoreşa 19'ê Tîrmehê bînin ziman, ji ber ku bingeha wê bi xwîn û rûmeta şehîd û birîndaran hatiye rûnandin."

**'Em dest ji destkeftiyên xwe bernadin'**

Seîd Ismaîl di dawiya axaftina xwe de bang li gelê Kurd kir ku yekîtiya xwe xurt bikin û got: "Em wek birîndarên şer nikarin dest ji van destkeftiyan berdin, ji ber ku me bedelên pir giran dane. Heta ku dilopek xwîn di laşê me de hebe, em ê ji bo parastina van nirşan bixebitin. Ev destkeftî berhema xwîna şehîdan û perçeyên ji laşê me ne, lewma destberdan jê ne pêkan e."




## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER KESÊ DEVBEREDAYÎ**

**Bêbinî ye:**
- Devberedayî ye; devsist e; gotin xwe pê re nagirin; gotinan digerîne.

**Bi devê xwe nikare:**
- Gotinên beredayî dibêje; devberedayî ye.

**Devê xwe pîs kir:**
- Dijûn kirin; gotinên nebaş gotin.

**Devê wî pîs e:**
- Bi heman wateyê.

**Devê xwe lewitand:**
- Bi heman wateyê.

**Devberedayî ye:**
- Gotinên nebaş dibêje; dijûnan dike; bi gotinên xwe mirovan diêşîne.

**Devçepel e:**
- Bi heman wateyê.

**Devleq e:**
- Devberedayî ye; devsist e; gotin xwe pê re nagirin; gotinan digerîne.

**Devsar e:**
- Gotinên nebaş ji devê wî derdikevin; mirovan bi gotinên xwe diêşîne.

**Devsariyan dike:**
- Bi heman wateyê.

**Li ber devê xwe nanêre:**
- Devberedayî ye; baş nebaş, hema çi tê ber devê wî dibêje.

**LI SER FIRSETÊ**

**Baran li kû bibare erdê xwe dibe wir:**
- Li firsetan digere; li ber ya xwe ye; qurnaz e; ne yê baweriyê ye.

**Dema gok hat ber kaşoyê te lê bixe:**
- Dema firser ji te re derket jê nebore. (Kaşo: Darekî hinge kopal dirêj e û serê wî bi girê ye)

**Dinya dûvê masî ye:**
- Dinya dinyaya firsetan e; jiyan zehmet e, dema firset ji destê mirov derdikeve weke dûvê masî, careke din bidestxistin zehmet e.

**Diz li şevên reş digerin:**
- Kesê niyeta wî xirab ji tevlîheviyê hes dike.

**Diz ji şeva tarî hes dike:**
- Bi heman wateyê.

**Dûvê dinyayê dirêj e/kuriya dinyayê dirêj e/kilkê dinyayê dirêj e:**
- Wê firset ji te re derkeve.

**Govenda guran roja mijê ye:**
- Di tevlîheviyê de mirovên xirab tiştên xirab dikin.

**Gur ji mij û moranê hes dike:**
- Kesê niyeta wî xirab ji tevlîheviyê hes dike.

**Hê devê te germ, deng bike:**
- Hê firset di destê te de heyî tiştekî bike

**Kû der tav be kurkê xwe li wir radixe:**
- Li firsetan digere; li ber ya xwe ye; qurnaz e; ne yê baweriyê ye.

**Kû der xwar e ew der ji min re war e:**
- Bi heman wateyê.

**Nêrî ji hewale borî:**
- Firset ji destê min derket.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Sudoku: Bersiv 83

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 9 | 8 | 3 | 4 | 5 | 1 | 7 | 2 |
| 3 | 5 | 7 | 9 | 1 | 2 | 6 | 8 | 4 |
| 2 | 4 | 1 | 7 | 8 | 6 | 3 | 9 | 5 |
| 8 | 1 | 2 | 5 | 9 | 7 | 4 | 3 | 6 |
| 5 | 7 | 4 | 6 | 3 | 1 | 9 | 2 | 8 |
| 9 | 3 | 6 | 8 | 2 | 4 | 5 | 1 | 7 |
| 1 | 6 | 5 | 2 | 7 | 3 | 8 | 4 | 9 |
| 4 | 2 | 9 | 1 | 6 | 8 | 7 | 5 | 3 |
| 7 | 8 | 3 | 4 | 5 | 9 | 2 | 6 | 1 |

Sudoku:Pirs 84


| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 4 | | | 6 | | 5 | 8 |
| | | | 7 | | 9 | | 6 | |
| | | | | | | 7 | 2 | 9 |
| 4 | 5 | 7 | | | | | | |
| 6 | 3 | | | | | | | |
| | | | | | | | | |
| 3 | 4 | 6 | | | | | | |
| | 8 | | 4 | | 1 | | | |
| 7 | 1 | | 8 | | | 3 | | |

## Rêwîtiya 8 salan a koçberiyê bi dawî bû



Gelê Efrînê ku di sala 2018'an de ji ber êrişên dewleta Tirk bi darê zorê ji warê xwe hatibû koçberkirin, rastî pêvajoyeke pir giran û bi êş hat. Koçberiya yekem ne ya dawiyê bû; gelê Efrînê ji ber êrişên cuda di nava 8 salan de 4 caran rastî pêlên koçberiyê hatin. Lê belê, bi peymana 29'ê Çileyê re deriyê vegerê vebû û rêwîtiya 8 salan a di nava koçberiyê de bi dawî bû.**R-7**

## Civîna Bilind a NATO'yê û guhertinên jeopolîtîk li Rojhilata Navîn (1)




Civîna Bilind a NATO'yê di vê dîmenê de ne tenê wekî platformek ji bo hevrêzkirina polîtîkayên parastinê di navbera dewletên endam de ye, lê wekî nîşaneyek ji nêzîkatiya hevpeymaniyê ji bo rûbirûbûna pirsgirêkên ewlehiyê yên pêşkeftî girîngiyek taybetî bi dest dixe.**R-6**

## 'Qanûnên sûcdarkirin, teslîmbûn û bi navê efûyê nayên qebûlkirin'



Hevberdevkê Înîsiyatîfa Yekîtiya Demokratîk û Parlamenterê Amedê Mehmet Kamaç diyar kir ku pêvajoya aştiyê gihîştiye xala girîng a gavên qanûnî, derengxistina van qanûnan wê baweriya gel bi dewleta Tirk biqedîne, yasayên bên derxistin jî divê berisva pêvajoyê bidin...**R-5**

## Zindawerên çand û hunera Kurdî



Hozan Serhed bû yek ji zindawerên dîroka çand û hunera Kurdî, sembola afirîneriya muzîkê ya pabendîdar û dengek ku ji nifşekî bo nifşên din di bîra gelê xwe de didome.**R-9**


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye


Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1395 | 19-Tîrmeh-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S


# VEJÎNA AZADIYÊ BI ŞOREŞA JINÊ DEST PÊ KIR

Bi vîn û berxwedaniya jinan Şoreşa 19'ê Tîrmehê şewq veda, bi taybetî jina Kurd gava yekem di nava şoreşa Rojava de avêt û pêşengtî ji destpêka azadiya jinan û gelê bindest di Sûriyê de kir. 14 sal ji temenê vê şoreşê derbas dibe, lê di nava her kêliyekê de jinê dîrokeke nivîsand, bi berxwedaniyê hebûna xwe da îsbatkirin û çavê jinan li azadiyê vekir.**R-2**




## Şaredariya Tirbespiyê ji bo başkirina xizmetguzariyan xebatan didomîne



Hevseroka Şaredariya Gel a bajarê Tirbespiyê Fehîma Temo destnîşan kir ku şaredarî ji bo pêşxistina xizmetan û bersivdayîna welatiyan bi awayekî berdewam xebatan dike...**R-8**


**Jin û Pêvajoyên Aştiyê û Biryarnameya 1325**
İsyan Karadeniz R-2


**Ji kontrola axê ber bi kontrola herikîna çavkaniyan**
Idrîs Henan R-4


**Zarok zeman û ziman**
Remezan Olçen R-9

# Vejîna azadiyê bi şoreşa jinê dest pê kir

Bi vîn û berxwedaniya jinan Şoreşa 19'ê Tîrmehê şewq veda, bi taybetî jina Kurd gava yekem di nava şoreşa Rojava de avêt û pêşengtî ji destpêka azadiya jinan û gelê bindest di Sûriyê de kir. 14 sal ji temenê vê şoreşê derbas dibe, lê di nava her kêliyekê de jinê dîrokeke nivîsand, bi berxwedaniyê hebûna xwe da îsbatkirin û çavê jinan li azadiyê vekir.

**Stêrk Mihemed**

Bihara Gelan pêleke mezin a serhildan, xwepêşandan û şoreşên gelêrî bû ku di dawiya sala 2010'an de li dijî rêjîmên dîktator û sitemkar ên Rojhilata Navîn dest pê kir. Ev bahoz di Adara 2011'an de gihîşt Sûriyê. Kurdan jî di nava vê hewayê de, di sala 2012'an de guhertin çê kirin. Şoreşa Rojava di 19'ê Tîrmeha 2012'an de li bajarê Kobanê dest pê kir û piştre li seranserî herêmên kurdî belav bû. Herwiha dema ku şerê navxweyî yê Sûriyê kûr bû, hêzên hikumeta Baasê ji herêmên kurdî vekişiyan, da ku giraniyê bidin ser bajarên mezin mîna Heleb û Şamê. Di vê valahiya siyasî û leşkerî de, gelê herêmê dest danî ser saziyên dewletê, ji wê û şûn de jî ji nava gel hêzên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) hatin avakirin. Rola sereke ya vêxistina çiroska şoreşê û avabûna hêzê ya jinan bû, bi taybetî jinên Kurd.

**Çima Şoreşa Rojava bi Şoreşa jinê tê naskirin?**

Şoreş Rojava piştî têkoşîn, azar, êş û zehmetiyan ji salên dirêj hate lidarxistin, para herî mezin ya zor û berxwedaniya van salan a jinê bû. Ji ber ku weke tê zanîn jin di her warî de dibe qurbaniya zihniyata paşverû û zayendperest ya zilam. Di heman demê de di nava sîstema desthilatdar a cîhanê de, jin tenê temamkirina rêjeya jiyanê dihate dîtin, ev yek li cem rêjîma Baas jî derbasdar bû ku mafê jinê bi hebûna mêr ve girêdayî bû, jiyankirina jinê bi minetî bû û helwestê wê di biryara derveyî û hundirê malê de mûcîzek bû. Lemwa yek ji sedem û armancên vê Şoreşê rizgarkirina jin û xuyakirina têkoşîna wê li hember sîstema desthilatdar bû.

Jina Kurd gava yekmîn di nava şoreşa Rojava de avêt ew bû ku pêşengtî ji destpêka azadiya jinan û gelê bindest di Sûriyê de kir. Di şoreşa Rojava de hate xuyakirin ku jin dikare bibe pêşeng û rizgarker. Jina Kurd bi deng, helwest, biryar û hêza xwe dest bi vê Şoreşê kir, da ku bibe destpêkek ji jiyana azad û bi rumet di Sûriyê de. Jinan bi israra xwe ya azadî û diyarkirina helwesta jinan di nava Şoreşê de, şoreşeke din avakir. Naskirina Şoreşa Rojava wekî "Şoreşa Jinê" ne pênaseyeke sembolîk an jî tenê pesnekî siyasî ye, ev pênase encama guhertineke radikal û piralî ye ku tê de jin ji kirdeyên pasîf ên dîrokê veguherîn pêşeng û avakerên sîstema nû. Di sedsala 21'an de, ev şoreş wekî modeleke bêhempa derket pêş û pîvanên şoreşên klasîk serûbin kirin. Li gorî felsefeya vê şoreşê "Heta jin azad nebe, civak azad nabe." Ji ber azadiya zayendî ne encameke, lê mercê yekem û bingeha avakirina herêmeke demokratîk e.

**Piştî Şoreşa Rojava rewşa jinê bi çi rengî bû?**

Piştî Şoreşa Rojava wargeha çarguşeyî ku jin têde sînordar mabû hate guhertin. Êdî bi destpêkirina vê Şoreşê re jinê cihê xwe di her warî de girt. Jinan karibû ku bi awayekî vekirî û rasterast nêrîna xwe pêşkêş bikin û helwestê xwe di bûyeran de diyar bikin. Jinên Kurd di vê şoreşê de ne tenê ji bo xwe têkoşîn û israra azadiyê kirin, lê belê ji bo tevahî jinên ku daxwaza azadiyê dikin û di tundiyê re derbas dibin, rabûn ser piyan. Bi rabûna Şoreşê re jinê cihê xwe di asta rêveberî, hevseroketî, berpirsyar û hwd… girt. Êdî bi Şoreşa Rojava zemîna ku jinê tenê di malê de sînordar dike, hate guhertin. Jinê cihê xwe di sazî û sazkirina wê de girt, bû xwedî erk û xebat. Herwiha jinê cihê xwe di hemû qadan de weke; Perwerde, siyasî, dîplomasî, civakî û leşkrî de girt û roleke mezin di serkeftinê wê de lîst. Li kêlek vê yekê jî jinan gelek berdêl dan û gelek ji wan jî bûn hedefa dagirkerî û zihniyeta zilamperest, armanca ew bû ku vê şoreşê di şexsê jinên pêşeng de têk bibin. Lê berxwedana jinan şoreş gihandin heya roja îro.

**Saziyên sereke yên jinan ku di herikîna şoreşê de hatine avakirin ev in:**

**Qada parastinê**
YPJ (Yekîneyên Parastina Jin) û HPC-Jin (Hêzên Parastina Cewherî - Jin).
**Qada rêxistinî û siyasî**
Kongra Star, Meclisên Jinan û Kombûna Jinan a Zenûbiya…
**Qada civakî û dadwerî**
Mala Jin, Meclisa Dada Jin.
**Qada zanist û perwerdeyê**
Akademiyên Jineolojiyê û Akademiyên Jinan ên Şehîd Amara…
**Qada aborî, çandî û hunerî**
Aboriya Jinê û Kooperatîf û Kevana Zêrîn…

**Şoreşa Rojava ango Şoreşa jinê çi bandor li Rojhilata Navîn û cîhanê kir?**

Şoreşa Rojava yê ku bi pêşengtiya jinê dest pê kir bandoreke mezin li Rojhilatê Navîn û cîhanê kir, jinên Kurd û hêza xwe YPJ'ê ne tenê hişmendiya zayenperest û pergala ku hertim jinê biçûk dixwe li Sûriyê şkandin, lê belê di vê Şoreşê de bi pêşengtiya jina Kurd hişmendî û nîrîna li beramberî jinê li Rojhilata Navîn û cîhanê hate guhertin. Şoreşa jinê li Rojava dest pê kir, lê belê di Rojava de sînordar nema belavî tevahî cîhanê bû û bandoreke mezin çêkir ku bi sedan jin li ser şopa jinên Kurd di Şoreşa Rojava de meşiyan û daxwaza azadiya xwe kirin. Jinê Kurd bi israra xwe ji bo tevahî jinan ji pêkhateyên cûda bû pêşeng. Şoreşa Rojava sînorên herêmî derbas kirin û bû hêviyek ji bo tevgerên jinan ên li seranserê cîhanê. Dirûşma bingehîn a vê şoreşê "Jin, Jiyan, Azadî" îro li her derê cîhanê ji Îranê heta Ewropayê wekî sembola serhildan û azadiyê deng dide.



Gelek kes ji dewletên Ewropî bi vê Şoreşê û hêza jinê bandor bûn weke; Judith Butler (Feylesof û Teorîsyena Femînîst a Amerîkî) wî got ku "Tekoşîna jinan li Rojava ne tenê ji bo herêmê, lê ji bo femînîzma global a herdemî rênîşander e. Wan nîşan da ku azadiya jinê, bingeha avakirina civakeke rasteqîn a demokratîk û azad e."
Noam Chomsky (Zanyar û Rewşenbîrê Amerîkî) diyar kir ku "Tiştên ku li Rojava diqewimin mûcîze ne. Di navenda herêmeke ku bi şer û paşverûtiyê hatî dorpêçkirin de, gel pergalekê ava dikin ku mafên kêmneteweyan diparêze û jinan di her astê de tîne pêş. Divê cîhan vê modelê biparêze."
Janet Biehl (Nivîskar û Çalakvana Ekolojîst a Amerîkî) bi wan gotinan Şoreşa Rojava û hêza jinê pênase kir: "Ez çûm Rojava û min bi çavên xwe dît ev şoreş di bingeha xwe de Şoreşa Jinê ye. Li her devera ku min serdan kir, min dît ku jin ne tenê di eniyên şer de ne, lê di saziyên akademîk, dadgeh û aboriyê de jî biryardarên sereke ne."
Şoreşa Rojava ango Şoreşa jinê bandoreke wiha li cîhanê kir, jina Kurd di vê Şoreşê de diyar kir ku jin dikare bibe pêşend, avakar û fermandar jî. Jina Kurd ne tenê li Rojava di nava Şoreşê de Şoreşeke din avakir, lê belê bi pêşengtiya wê li tevahî cîhanê Şoreş lidarxist. Hêza jinê ango YPJ'ê cîhan ji hêza herî xeter û teror rizgar kir, hêza ku her kes jê ditirsî ew ji îrade û vîna YPJ'ê tirsiya. YPJ'ê ne tenê hêzeke leşkerî ye, lê belê ji bo tevahî jinan hêzeke civakî û siyasî ye jî.

**Destkeftiyên ku jinê di nava 14 salan de bidestxistine û hewildana qebûlkirina statûya jinê di destûra Sûriyê ya nû de**

Di nava 14 salan de bi pêşengtiya jina Kurd li Rojavayê Kurdistnê jinan gelek destkeftî bidest xistin, ev salên dirêjin jin bi berxwedan û hêza xwe parastina wan destkeftiyan dikin herwiha li ser wê esasê kar û xebatê xwe didomînin. Destkeftinên ku jinan li Rojavayê Kurdistanê bidest xistine bû para her jinekî ku hêviyê wê azadî û têkbirina zihniyata zayenperestiyê ye. Ev Şoreş ku bi sedan destkeftî bi xwe re ji bo jinan anîn bû tecrûbeyeke mezin ji jinên cîhanê re. Şoreşa Rojava ku bi berdêlên giran, şahadetê û berxwedaniyeke mezin a gel û jinan hateye parastin îro dixwazin wê bi hêsanî winda bikin.
Di 8'ê Kanûna 2024'an de rêjîma baas piştî desthiltdariya zêdetirî 60 salê hilweşiya, piştî vê hikumeteke nû a bi navê hikumeta demkî a Sûriyê hate serdesthilaydariyê. Bi hatina vê hikumetê re hêviyê gel gelek bûn, lê bi dirêjahiya sal û nîvekê li ser hatina vê hikumetê re tu guhertin di Sûriyê de çênebûn, lê belê kirîz kurtir bûn û hêviyê gel bû xewnek. Dîsa û careke din hikumeta demkî a Sûriyê heman hişmendî û zihniyata zayendperestiyê li ser jinê dimeşîne. Bi hatina vê hikumetê re bi sedan jin hatin qetilkirin û revandin bêyî ku hesab ji sûcdaran were xwastin ango lêpirsîn were kirin.
Jina Kurd li Rojavayê Kurdistanê ji bo vê tevgerê hikumete demkî a Sûriyê neqebûlkirin û bertekên xwe nîşandan û diyar kirin hişmendiya vê hikumetê li bermaberî jinê dişibe ya rêjîma baas û DAIŞ'ê. Herwiha ji bo parastina hemû jinan û hembêzkirina wan li Sûriyê helwesta xwe nîşandan. Lê hikumeta demkî a Sûriyê heya niha û li gorî hemû hewildanan jinê di nava Sûriyê de weke endameke civakê ya xwedî îrade û biryar qebûlnake, şerê li hember hişmendiyake wisa li bermaberî jinê beriya Şoreşa Rojava niha xwe dobare dike.
Hikumeta demkî a Sûriyê hêza jinê di nava wezareta parastinê de qebûlnake herwiha Yekîneya Parastina Jin (YPJ) weke hêzake jin a fermi di Sûriyê de qebûlnake. Her kes YPJ'ê nasdike, YPJ'ê cîhan ji DAIŞ'ê parast û jiyanek nû ji gel û jinan re afirand. Neqebûlkirina YPJ'ê tê wateya ne qebûlkirina tevahî jinan. Yek ji destkeftiyên Şoreşa Rojava û jinan YPJ'ê ye. YPJ'ê û jinan di hewildana avakirina Sûriyeke demokrat xwedî roleke mezin, herwiha jinan berdêla herî mezin di şer û pevçûnên Sûriyê de dan, di haman demê jina Kurd ji bo tevahî jinên Sûriyê salên dirêje di nava têkoşînê de ne. Ji bo vê jî pêwîste statûya YPJ'ê û mafê hemû jinan de destûra Sûriyê de were parastin, bêyî misogerkirina mafê jinê destûra Sûriyê a nû pêknayê. Eger reng û dengê jinê tune be Sûriyê ber bi demokrasî ve naçe, ji bo vê jî di serî de YPJ'ê û hemû partî, sazî û rêxistinên jin di Rojava ji bo vê yekê di nava tekoşîn û hewildanên mezin dane.

Akademiya Jîneolojî

**Jin û Pêvajoyên Aştiyê û Biryarnameya 1325**

İsyan Karadeniz

Belkî wêneya herî navdar ku dema em li ser pêvajoyên aştiyê difikirin tê bîra mirov, ew wêne ye ku em tê de gelek ji aliyên şerker dibînin ku ali welatekî bêalî dicivin, û li dora maseyeke dorûber rûdinin, bi alîkariya nûnerekî navdewletî yê ku hêsankirina pêvajoya danûstandinê dike, û tekezbûnê dide ser gihîştina peymaneke ku dê dawî li nakokiya ku ew alî tê de cih digirin bîne. Ev nêrîn li ser pêvajoya aştiyê nêrîneke pir teng e, ji ber ku pêvajoyên aştiyê ji tenê danûstandin û peymanên aştiyê pir berfirehtir in; her wiha ew nêrîneke pir zayendî ye, ji ber ku piraniya nûnerên aliyên şerker û navbeynkarên li ser maseya aştiyê mêr in. Mixabin, ev tenê ew qonaxa yekane ya pêvajoyê ye ku pir caran ji aliyê ragihandinê ve tê vegirtin.
Hinek faktorên girîng hene ku divê li ser cewherê tevlihev ê pêvajoyên aştiyê de li ber çavan bên bigirin.
Ya yekem: Pêvajoya aştiyê bi hêsanî bi rûniştina aliyên şerker a ji bo meşandina danûstandinên aştiyê dest pê nake, mîna ku ew bi îmzakirina peymana aştiyê jî bi dawî nabe.
Ya duyem: Ew ne tenê aliyên şerker û navbeynkar di nav xwe de dihewîne, belê her weha komeke berfireh ji sazî û aliyên çalak ên herêmî, neteweyî, herêmî û navdewletî jî daxilî nav xwe dike.
Ya sêyem: Di dema ku armanca bingehîn a danûstandinên aştiyê danîna sînor ji bo nakokiya çekdarî ye, peymanên aştiyê ji agirbestê derbas dibin. Ji ber ku ew hîmên avaniya civaka piştî nakokiyê datînin, her ku lihevkirineke siyasî pêk tê.
Di dema danûstandinên aştiyê yên ku di sala 2000'an de li Somalyayê birêve çûn, beşdarbûn tenê bi ser pênc eşîrên Somalî ve sînordar bû, û ji ber ku mêr bi awayekî kevneşopî nûnertiya eşîran dikirin, jinên Somalî xwe li derveyî danûstandinan dîtin. Li ser vê yekê, komek çalakvanên di qada aştiyê de ji eşîrên cuda bi serokatiya Eyşe Hecî Elamî, xwe wekî nûnerên «Eşîra Şeşem», eşîra jinan, ragihandin û li derveyî cihê danûstandinan ava bûn, û daxwaz kirin ku destûr ji bo beşdarbûna wan di pêvajoya aştiyê ya fermî de bê dayîn, û di dawiya dawî de hatin qebûlkirin ku wekî beşdar cih bigirin û danûstandinan bikin; ku di encamê de, di nav tiştên din de, kotayek ji bo jinan di kursiyên parlamena federal a demkî de hat veqetandin û wezareta jinan hat avakirin, û Peymana Neteweyî ya ku wan alîkariya amadekirina wê kir, wekî projeya herî baş a li herêmê tê hesibandin. Mînakên li vê derê nihêrînekê li ser wî şerî pêşkêş dikin ku jinan li bakur û başûrê cîhanê girtiye ser xwe da ku di danûstandinên aştiyê de bên temsîlkirin û beşdar bibin.
Minakekî din jî; nûnerên ji bo danûstandinên aştiyê yên sala 1998an li Îrlanda Bakur bi rêya hilbijartinên giştî hatibûn hilbijartin, Monica McWilliams (akademîsyena femînîst a ji başûrê Belfastê) ligel Pearl Sagar (pispora civakî ya protestan a ji rojhilatê Belfastê) Koalîsyona Jinan a Îrlanda Bakur ava kirin da ku zextê li partiyên siyasî bikin daxilî nav lîsteyên namzedên wan bibin. Dema ku wan guh neda vê yekê, wan biryar da ku partiyeke taybet bi xwe ava bikin û bikevin hilbijartinan. Bi vî awayî, McWilliams û Sagar karîn beşdarî danûstandinên piralî yên partiyan bibin, ku bûn sedema Peymana Înîya Baş (Peymana Mezin a Înê); peymana ku ji bo veguhestina desthilatdariyên qanûnî bo Meclîsa Neteweyî ya Îrlanda Bakur xebitî, her weha bû sedema kêmkirineke berçav di asta tundûtûjiyê de.Fêmkirina wan çarçoveyên civakî, dîrokî, siyasî, aborî û çandî yên ku jin bi rêya wan hewla zêdekirina temsîl û beşdarbûna xwe di pêvajoyên aştiyê de didin, da ku bi vî awayî ji bo wan gengaz bibe ku dîtineke çêtir li ser astengî û zehmetiyên li pêşiya xwe ava bikin.



# Çiyayê Feis; Armanca Trump ya nû ye

Gefên herî dawî yên Serokê Amerîkayê Donald Trump ên li ser hilweşandina binesaziya nukleerî ya Îranê ya binê "Çiyayê Feis (Pickaxe Mountain), nîqaş û gumanên nû li ser ast, bandor û girîngiya stratejîk a vê navenda asê ya binerdî derxistin holê.

**Navenda Nûçeyan**

Serokê Amerîkayê Donald Trump di hevdîtnekê de ku di 13'ê Tîrmehê pê re hatiye çêkirin diyar kir ku; "Em ê Çiyayê Feis hiliwşînin. Ji Îraniyan re bêjin xwe amade bikin." Çiyayê Feis (Pickaxe Mountain), li nêzî tesîsa nukleerî ya Natnaz ya Îranê ye, bi hevahengiya domandina êrişên Amerîkayê li ser cihên cuda yên Îranê ve û di heman dema ku Wahngtonê Çiyayê Fas wekî yek ji tesîsên nukleerî yên herî bi hêz bi nav dike jî, Îran tekez dike ku ew tesîs ji bo komkirina cîhazên (Terda Navendî) ye. Gelo çima "Çiyayê Feis" bûye armanceke nû ji bo Trump?
Di rojên dawî de Çiayayê Feis bûye yek ji sernavên berbiçav ên pevçûna Amerîka û Îranê. Li gorî raporan, ev yek nîşan dide ku bala Amerîkayê ji hedefgirtina şiyanên leşkerî yên kevneşopî veghurî cihên girêdayî bernameya nukleerî ya Îranê ve.

**Çiyayê Feis li ku deverê ye?**

Cihê wê di hundirê çiya de ye bi dirêjahiya 1,6 kîlometre ber bi başûrê Tesîsa Natnaz a Nukleerî ve, bi farisî bi "Koh Koleng Ghaz La" tê nasîn. Çiyayê Feis 220 kîlometre li başûrê Tehranê ye û du kîlometreyan dûrî kompleska nukleerî ya Natnazê ye. Natnaz ku du stasyonên dewlemendkirina yuranyûmê lê hene, rastî êrişa Amerîkayê û Îsraîlê di 28'ê Sibatê de hat. Herwiha di şerê sala borî de ku 12 rojan berdewam kir.
Bilindahiya lutkeya çiya nêzî 1600 metre li ser asta rûberî ya deryayî ye. Du stasyonên ku lê hene di asta xebitandinê de ne, yek li ser erdê û yek li bin erdê ye. Ajansa Navdewletî ya enerjiya Atomî ya girêdayî Neteweyên Yekbûyî diyar kir ku stasyona li ser erdê hatiye têkbirin. Lê stasyona din ya bin erdê dibe ku hin zirarên mezin lê hatiye kirin.

**Dîroka Çiyayê Feis**

Ev cih bi bernameya nukleerî ya Îranê ku ev demeke dirêje rêgeşiyeke di navbera rojava û Îranê de çêkiriye, girêdayî ye. Îran jî idayên hewldanên wê ji bo bidestxistina bombeya atomî red dike. Li gorî ku Peymangeha Zanistî û Ewlehiya Navdewletî diyar kiriye, avakirina tesîsê di sala 2020'an li "Çiyayê Fas" destpê kiriye, dema ku rayedarên Îranê wê çaxê gotin ku teqîneke bi sedema sabotajê çêbû. Di heman demê de diyar kirin ku sabotaja Natnzê gelek zirar bi xwe re anî, ku dikare bibe sedema kêmbûna pêşveçûna cîhazên Terda Navendî ya pêşketî ji bo dewlemendkirina yuranyûmê.
Di Îlona wê salê de jî, Serokê Rêxistina Enerjiya Atomê ya Îranê yê wê demê Alî Ekber got ku Îran dest bi avakirina "holeke nûjentir, mezintir û ji her alî ve berfirehtir li navenda çiyayê nêzîkî Natanzê" ji bo çêkirina cîhazên Terda Navendî yên pêşketî, kiriye.
Rêvebrê giştî yê Ajansa Navdewletê ya Enerjiya Atomê ya girêdayî Neteweyên Yekbûyî Rafael Grossir, digel hevdîtinekê bi PBS Frontline di meha Adarê de îşaret kir ku Îran berî niha niyeta xwe ya pêkanîna çalakiyên nukleerî li Çiyayê Feis, raghandibû û wiha lê zêde kir: "Ev yek beşeke ji niyeta wan a sîstematîk ji bo ku tesîsên xwe yên herî hestiyar bixin bin erdê, bû."

**Îran di wir de çi ava kir?**

Peymangeha ku wêneyên satelîtê ya vî cihî analîz kiriye eşker kir ku tesîs ji du deriyan pêk tê, dibe ku her du ber bi yek tesîsekê ve diçin û kurahiya wê ne kêmî 100 metre di bin çiya de ye. Peymangehê di raporekê de ku di 14'ê tîrmehê de hatiye weşandin, tê de destnîşan kiriye ku bi gelemperî tedbîrên parastina madî ji hawîrdoreke bi ewle, çarçoveyeke berfireh û hêzeke mezin ji bo deriyên tunelan, pêk tên.
Di rapora peymangehê de bal hat kişandin li ser her du deriyên tunelê yên aliyê rojhilat, hat diyar kirin ku ji bo astengkirin gihaştina erebeyên bejahî, ji destpêka her du pevçûnan beşeke ji wan hatiye hilwişandin, lê bi tevahî ne hatine girtin.

**Ev tesîs fikaran çêdike, çima?**

Li gorî raporên îstxbaratên Amerîkayê, tesîs di bin kevirên



Giranêt ên zexm bi sedê metreyan hatiye avakirin, da ku li hember bombeyên bunkerşikêner xurt bimîne.
Li gorî malpera Monîtor, Îstxbarata Amerîkayê dibîne ku Îran ji bo dewlemendakirina yuranyûmê hewil dide ku tesîseke veşartî ava bike, da ku bibe "vebijarkek yedek a stratîjîk" ji bo ku parastina bernameya xwe ya nukleerî bike, dema ku tesîsên din li hemberî êrşan bên.
Li hember vê yekê jî, Tehran tekezî dike ku ev cih tenê ji bo komkirin û çêkirina cîhazên Terda Navendî ya pêşketî ye, ne ji bo dewlemendkirina yuranyûmê.

**Washngtonê çavdêriyê dike**

Trump di daxuyaniyên xwe de di 13'ê Tîrmehê de, wiha got; "Wahngtonê ji nêz ve çavdêriya "Çiyayê Feis" dike, em tu çalakiyekê li wir nabînin. Ji aliyê bernameya wan a nukleerî ve helwesteke wan a baş nayê nîşan dan. Her gava ku em dibihîzin, em wê diteqînin. Ji ber vê yekê, ew hez nakin ku li ser vê yekê biaxivin. Lê belê em ê bi îhtimaleke mezin di demek nêzîk de êrişî Çiyayê Feis bikin."
Di rapora peymangehê wiha hat nirxandin: "Tê nîşan dan ku tesîs hîn dest bi xebitandinê nekiriye, lê xebatên avakirinê hîn berdewam in, li gorî wêneyên setalîtê ne diyar e kengî wê dest bi xebirandinê bike."
Raporê wiha berdewam kir: "Ne diyar e ka Îran hîn pilana avakirina tesîseke komkirinê ya berfireh dike, ji ber hiliwşandina bernameya Terda Navendî ya Îranê di nav de şiyana Îran li ser çêkirina pêkhateyên Terda Navendî yên pêwîst ji bo kargeha komkirinê."
Herwiha hat diyar kirin ku eger Îran dest bi ji nû ve avakirina şiyana xwe ya çêkirina cîhazên Terda Navendî bike, dibe ku ew pilan dike li Çiyayê Feis tesîseke biçûktir ji bo komkirina Terda Navendî ya Îranê bike, ji bo kubikaribe xizmeta bernameya xwe ya nukleerî bike.

# Parlamentoya Îsraîlê Knesset xwe fesix kir

**Navenda Nûçeyan**

**Parlementoya Îsraîlê (Knesset) piştî temamkirin wîlayeta xwe ya çar salan, di xwendina xwe ya dawî de li ser fînansekirina partiyan erê kir û ji bo pêkanîna hilbijartinên 27'ê Cotmehê, xwe fesix kir.**

Parlementoya Îsraîlî di êvara roja pêncşemê de fesxkirina xwe ragihand, ev gav rê li ber hilbijartinên giştî ku dê di 27'ê Cotmehê de bê li dar xistin, hat avêtin. Di heman demê de bi nêzîkbûna salvegera 3'yemîn a êrişên Cotmehê pêk hat, ku bi xwe re bandorên ewlehîm leşkerî û siyasî yên kur, anî.
Fesixkirina Knessetê di demekê de hat ragihandin ku serokwezîrê Îsraîlê Benjemin Netanyahu ji bo



parastina desthilata xwe bi gelek pirsgirêkên re rû bi rû ye. Anketên raya giştî ya Îsraîlê nîşan didin ku partiyên muxalefetê ya bi serokatiya serokwezîrê berê Naftali Bennett û Serokê Berê yê Serfermandariya Îsraîlê Gadi Eisenkot ku serokê tevgereke navendî ye ji aliyê gel ve tên piştgirîkirin.
Di hefteya borî de jî parlementoyê gelek rûnştin li dar xistibû, tê de gelek qanûn hatin erê kirin, di çarçoveya hewldanên Nitnyaho de ji bo pejirandina komeke ji projeyên wî yên siyasî berî ku dewreya parlemento bi dawî bibe.
Ji wan qanûnan, erêkirina du qanênên ku dibêje tevlîbûna zilamên cihu yên (Haredim) ji bo artêşê bêne rawestandin, di gavekê de armanc dike ku tevlîbûna partiyên olî bo her hikumetekê ku Nitinyaho dê piştî hilbijartinan ava bike, bê misogerkirin.
Herwiha parlementoyê (Kneest) hejmareke ji qanûnên girêdayî pilana hikumetê ji bo jinûve sazkirina heykela dadweriyê, erê kir. Di nav de berfirehkirina desthilata hikumetê li ser wesîleyên raghandina fermî û qelsbûna desthilatên şêwirmenda dadweriya hikumetê. Şêwirmenda dadweriya Gali Bharav – Myara berî niha li dijî van reforman bertek nîşan dabû, ev yek hişt ku ew bibe armanceke dubare ji bo rexneyên Nitinyaho û partiyan.
Serokê Knessetê Amir Ohana dema ragihandina fesixkirinê de axivî û got: "Em çar salan diqedînin. Di vê heyamê de me 9 budçe û bi sedan qanûn derxistin. Ez ji bo baweriya ku we da min spasiya we dikim. Bi vê baweriyê me bi hev re hişt ku em çar salan temam bikin."
Di dîroka Îsraîlê de hikumeteke ku çar salan tenê temam bike bûyereke kêm e. Hikumeta dawîn ku bêyî hilbijartinên pêşwext dema xwe ya destûrî temam kir di sala 1988'an de bû. Netanyahu jî di dîroka Îsraîlê de herî dirêj di posta serokwezîrtiyê de maye.

# Pêvajoya Aştiyê; Di navbera xeyala manîpulasyonê û rastiya jiyana hevbeş de

**Cemîl Xoce**

Aştî ne tenê rawestandina demkî ya şer e. Aştî projeyeke jiyanê ye. Ew avakirina civakê li ser bingehê edalet, wekhevî û hevdu-qebûlkirinê ye. Îro li Tirkiyê behsa "pêvajoyeke aştiyê ya nû" tê kirin. Lê pirsa bingehîn a ku rastî derdixe holê ev e: Gelo em bi rastî li pêşiya veguherîneke rastîn in, an em li pêşiya manîpulasyoneke siyasî ya nû ne ku dixwaze demê bi dest bixe û pêlên înkarê ji nû ve rêz bike?

### Dewlet û mantiqa wê ya xetimî

Ji bo serketina her pêvajoyeke aştiyê, pêşî divê mirov xwedî wêrekî be ku bi rabirdûyê re rû bi rû bimîne. Siyasetên dewletê bi salan li ser bingehê mantiqa yekalîtî û yekrengî hatin avakirin. Ev mantiq cuda-rengiyê red dike, nasnameya gelan înkar dike û mafên bingehîn nas nake. Ji bo ku aştî bi ser bikeve, divê ev hişmendî ji kokê ve were guhertin. Pêwîst e dewlet ji zihniyeta "dewletneteweya navendî" ya ku nasnameyan dihelîne, derbasî zihniyeta "neteweya demokratîk" bibe ku bi hemû reng, çand û cudahiyên xwe ve herkesî dihewîne.

Heya niha, niyeta dewletê ne ciddî xuya dike. Tu gavên qanûnî yên şênber tunene, naskirina mafên destûrî tuneye. Di hemwextî pêvajoya aştiyê de, Tirkiye êrîşên leşkerî bi ser Rojava de birin. Bêguman em behsa êrîşên çileya vê salê dikin. Li aliyekî behsa aştî û çareseriyê tê kirin, lê di heman demê de dewlet bi her tiştî berevajî wê nîşan dide. Ev nakokiya berbiçav dide nîşandan ku pêvajo hêj di bin bandora "Taktîkên krîzê" de ye û ne stratejiyeke çareseriyê ye. Aştiya rastîn wêrekiya naskirina ya din dixwaze, ne hewldana teslîmgirtin an tunekirina wî.

### Astengiyên li pêşiya projeya Aştiyê

Aştî li ser bingehê "hevdu-qebûlkirinê" tê avakirin. Tevgera Azadiya Kurd, bi dîroka xwe ya têkoşînê ya ku 50 sal derbas kiriye û bi girseya xwe ya bi mîlyonan mirovî, xwedî îradeyeke siyasî û civakî ye ku nayê paşguhkirin an tunekirin. Binavkirina vê tevgerê wekî "teror", reva ji rastiyê ye; hewldana înkarê ye. Aştiya rastîn diyaloga bi îradeya gel re dixwaze, ne ew xeyalên ku dewlet hewl dide di mejiyan de biçîne da ku şerên xwe rewa bike.

Faktorên derveyî jî astengiyeke mezin in. Hêzên navneteweyî bi piranî li hemberî binpêkirinan çavên xwe digirin û ji bo berjewendiyên xwe yên teng, polîtîkayên dewletê piştgirî dikin. Ev peymanên veşartî yên ku li odeyên tarî tên kirin, mafên gelan dikin qurban. Êrîşên çileyê yên li ser herêmên Kurdan, ji Şêx Meqsûd û Eşrefiyê bigire heya Hesekê encama vê bêdengiya navneteweyî ya bêbext bû ku biryara wê li Parîsê hatibû dayîn. Aştî di bin siyên peymanên ku xwîna gelan difiroşin de nayê avakirin. Aştî, helwesteke navneteweyî ya exlaqî dixwaze ku rêzê li vîna gelan a ji bo biryardana çarenûsa xwe û parastina hebûna xwe digire.

### Çareserî: Modernîteya Demokratîk e

Çareserî ne di vegera bo rabirdûyê de ye, di pejirandina modela "modernîteya demokratîk" de ye. Ev model dibîne ku civak bingeh e; divê dewlet xizmeta civakê bike, ne zîndana wê be. Aştiya rastîn "aşitiya civakî" ye. Ew e ku hemû pêkhat "Kurd, Ereb, Suryan û yên din" di bin sîwana sîstemeke demokratîk a nenavendî de bijîn, ku rûmeta mirov biparêze. Ev model alternatîfeke şaristanî li şûna şerên neteweyî û olî pêşkêş dike, ku tê de demokrasî di civat û komunan de dibe pratîka rojane, ne tenê sloganên hilbijartinê yên vala.

Divê em fam bikin ku kokên pirsgirêkê vedigerin çend dehsalên berê. Avakirina dîrokî ya Komara Tirkiyê li ser peymanên navneteweyî yên parçekirinê bû, ku erdnîgariya herêmê wekî xelatên kolonyalîst parçe kir. Ji wê demê ve, aqîdeya înkarê serdest bû. Nasnameya Kurdî bi darê zorê hate paşguhkirin û her daxwazeke mafan wekî "metirsiya hebûnê" hate dîtin. Ev mantiq herêm anî halê wêranî û şerê berdewam. Aştî şikandina vê xeleka xerab dixwaze. Pêwîstî bi naskirina wêrekane ya çewtiyên dîrokî heye, da ku hîmên jiyana hevbeş li ser bingehê wekheviya tam werin danîn.

Naveroka aştiyê di "siyaseta exlaqî" de ye. Siyaseta ku ne armanca wê desthilatdarî ye, lê çareserkirina pirsgirêkên civakê ye. Tevgera ku vê fikrê dipejirîne, bawer dike ku aştî civakeke hişyar û rêxistinkirî dixwaze, ku karibe mafên xwe bi xwe biparêze, bêyî ku li benda bexşên desthilatdaran bimîne.

Aştî ne bexşeke dewletê ye, mafekî bingehîn ê gelan e. Ger dewlet dilsoz be, divê dawî li siyasetên dûrxistinê bîne, mantiqa leşkerî rawestîne û pêvajoyeke demokratîk bide destpêkirin ku herkesî dihewîne. Aştî îradeyeke xurt dixwaze ku û divê dewlet heman vîna ku tevgerê nîşan daye, nîşan bide.

Dewlet yan dê rêya aştiya dadmend hilbijêre ku mafên herkesî di welatekî demokratîk de misoger dike, yan jî dê di nav çerxa înkarê de bimîne ya ku ji bo herkesî tenê wêraniyan tîne. Kurd, bi fikirên xwe yên azad û îradeya xwe ya pola, her tim ji bo çareseriyê amade ne. Lêbelê, bi zelalî, ew qebûl nakin ku aştî wekî teslîmbûnê be. Aştî peymaneke di navbera azadan de ye û azadî nayê dayîn, bi têkoşîn û berxwedana hişyar tê bidestxistin. Kurd destê xwe yê aştiyê dirêj dikin, lê di heman demê de mertalê parastina hebûnê jî hildigirin. Gelo bersiv dê çi be?

# Qibleya Şoreşa Rojava; Şoreşa Jin e

**Amara Baran**

Dema ku em behsa şoreşa Rojava dikin, yekser bala mirov diçe ser serkeftinên leşkerî, an jî damezrandina Rêveberiya Xweser. Lê serkeftina herî mezin û bingeha şoreşê destkeftiyên jin e. Di dîroka mirovahiyê de gelek şoreş çêbûne, piraniya wan şoreşan li ser esasê hilweşandina desthilatdaran bû, ku di aliyê zîhnî de tu guhertinên bingehîn nedane çêkirin. Şoreşa Rojava; yekem mînakên şoreşan e ku di gelek waran de guhertin û veguhertinên bingehîn da çêkirin. Rêber Apo Şoreşa Rojava wekî pêngaveke dîrokî ya serkeftina paradîgmaye "Modernîteya Demokratîk" dinirxîne. Şoreş ne tenê ji bo Kurdan, lê ji bo hemû gelan bûye hêviya jiyaneke azad û wekhev, ku bingeha wê li ser ekolojî, azadiya jinê û neteweya demokratîk hatiye avakirin.

Di dîroka mirovahiyê de cara yekem, li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê pêlên şoreşê ku bi navê "Şoreşa Jin" hatiye nasîn, wek volkanekê berbelav bû. Ev şoreş tenê di herêmekê an bajarekî de sînordar nema, bandora xwe li ser jinên cîhanê kir û bû mînakek ji têkoşîna azadiya jin re.

Rêber Apo ji bo, rola jin di şoreşê de jî wiha dibêje; "Şoreşa jinê bingeha tevahiya şoreşan e. Civak bê azadiya jinê ne dikare azad bibe, ne jî demokratîk bibe, ji ber wê jî azadiya jinê şertê bingehîn yê avakirina civaka demokratîk e".

Belê; jin ne tenê parçeyek ji şoreşê ye, pêşeng û xwedan hêza guhertin û veguhertinê ye. Bi yekîtî û rêxistinbûyina jinan, bi têkoşîn û pêşengtiya wan, civak dikare ji zihniyeta ku desthilatdarî xwe li ser ferz dike, xwe rizgar bike.

Di pêvajoya 2014'an de dema ku Rojava di nav agirê şer de dinaliya, yên ku di vî agirî de herî zêde êş û azar dîtin jin bûn. Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) hem bûn dengê qêrîna jinan û hem jî bûn dengê azadiya jinê. Jinên ku di çembera çeteyên DAIŞ'ê de mabûn û li bazaran weke kole dihatin firotin, bi têkoşîna YPJ'ê rizgar bûn. Ji ber vê yekê, YPJ'ê roleke dîrokî di xilasiya jinan de lîst. YPJ'ê ne tenê hêzeke leşkerî ye, ew di heman demê de sembola îradeya jinê ye. Berxwedana wê ji Kobanê bigre heta Şengalê û ji Minbic, Reqqayê, Dêrezor heta gelek herêmên din nîşan da ku jin dikarin hem xwe hem jî civaka xwe biparêzin û di pêkanîna azadiyê de bi fikra netewa demokratîk pêşengiya guhertina civakî bikin. Berxwedana YPJ'ê li dijî DAIŞ'ê di asta cîhanî de jî nerîna li ser hêza jinê guhert û ew bû sembola berxwedanê.

Bi îlankirina şoreşê re, êrişên pir alî jî destpê kirin. Li hemberî van êrişan berxwedaneke dîrokî pêk hat û gelek berdêlên giran ji aliyê jin ve hatin dayin. Hêzên desthilatdar û kujer ji ber ku destkeftiyên jinan qebûl nedikirin raste rast destkeftiyên wan hedef girtin. Êrîşên dawiyê yên ku ji aliyê HTŞ, DAİŞ'ê û dewleta Tirk ve ku hatin kirin, armanc hedef girtina paradigma azadiya jin bû. Ew hêzên ku jinê wek kole dibinin, dema ku îradeya jin derdikeve û xuya dike hedef digre.Îro carekedin heman hêz ji bo ku destkeftiyên şoreşê, yên ku bi destê jin hatiye parastin, bi neqebûlkirina statuya jin di Sûriyê de ji holê rakin.

Çeteyên DAIŞ'ê ku tevahiya cîhanê xistine nav tirsê, bi têkoşîna jinan hatin têkbirin. YPJ tenê şerê çekdarî ne meşand; di heman demê de şerê fikir û zihniyetê jî meşand. Ji ber vê yekê, Rêber Abdullah Ocalan şoreşa jinê wek bingeha avakirina jiyana azad û demokratîk dinirxîne. Têkoşîna YPJ'ê di cîhanê de dengvedanek mezin afirand û ji bo gelek tevgerên jinan bû çavkaniya îlhamê.

Jina ku di malê de hatibû girtin, YPJ'ê qeyd û benden ku li ser jin hatibû ferzkirin ji holê rakir. Armanca "Şoreşa Jin" ne tenê li dijî pergala desthilatdar û mêrpereste, lê di heman demê de armanca wê avakirina civakeke ku azadî, wekhevî û demokrasî li ser bingeha azadiya jinê ava dike ye. Ji ber vê yekê, şoreşa jinê tenê şoreşeke siyasî an leşkerî nîne, ew şoreşeke fikrî, civakî û çandî ye ku ji koka wî guhertina zîhniyeta mêrpereste. YPJ'ê li li gel rola xwe ya parastinê, di xebatên perwerdeyî, rêxistinkirina jinan, belavkirina hişmendiya xweparastinê û xurtkirina beşdariya jinan di jiyana civakî de jî tevlî bû. Felsefeya YPJ li ser vê bingehê ava bûye ku parastina civakê bê azadiya jinê pêk nayê, û azadiya jinê jî bê rêxistin û xweparastinê nayê parastin.

Ji ber vê yekê, gotina "Qibleya Şoreşa Rojava; Şoreşa Jin e" tenê gotineke sembolîk nîne. Ew rastiyeke dîrokî ye ku di pratîka Şoreşa Rojava de hatiye îspatkirin. Rola jinan û bi taybetî YPJ'ê nîşan da ku jin ne tenê beşek ji şoreşê ne, hêza sereke ya pêşvebirin, parastin û domandina wê ne.



# Çima rêxistinên mirovî kiryarên ku derheqê gelên Sûriyê dibin, dernaxin?

Ji destpêka sala 2026'an ve nêzî 2 hezar kes li Sûriyê hatine kuştin, li hêla din kirîza aborî, talankirina malan, hişmendiya radîkal, kiryarên terorî li ser gelên Sûriyê tê pêkanîn. Gel di xeleke ji agir de tên sotin û kuştin, hikumeta demkî berpirsyar e, rêxistinên mirovî yên cîhanî çima kiryarên heyî dernaxin û çima hewlên Trump hene ku hikumeta Sûriyê ji lîsteya dewletên piştgirtiya terorê dike, derxe?

**Hemze Sêvo**

Ji dema ketina rejîmê di dawiya sala 2024'an de, Sûriyê bi guhertinên siyasî û ewlehiyê yên kûr rû bi rû ma. Lê belê dawîhatina rejîmê ne tê wateya ku tundûtûjî an jî êşa gelên Sûriyê bi dawî bû.

Piştî ketina rêjîmê welat bû şahidê zêdebûna şer û tevlîheviyê. Herwiha çalakiyên tolhildanê, kuştina bi zanebûn, teqîn û binpêkirinên cuda zêde bûn. Her çend di qonaxa piştî ketina rejîmê de hêvî hebû ku aramî vegere û xwînrêjî raweste, lê rastiyên meydanî nîşan dan ku Sûriyê hîna jî di bin giraniya tundûtûjiyê de ye, ji brer ku li seranserî Sûriyê her roj qurbanî hatin tomarkirin. Rêjeya herî mezin a kuştiyan sivîl bûn, di nav wan de jin û zarok jî hebûn. Ev kuştin di encama operasyonên leşkerî, bombebaranê, mayînên binerd, sûcên derzagonî, pevçûnên herêmî û tolhildanê de rû dan. Rewangeha Mafên Mirovan a Sûrî (SOHR) ji dema ketina rejîmê heta dema heyî kuştin zêdeyî 13 hezar û 546 kesî tomar kiriye; di nav wan de sivîl, leşkerî û şervanên ji hemû aliyan hene. Ev hejmar li ser sê qonaxên demî yên sereke hate dabeşkirin. Çavdêriyê kuştina du hezar û 354 kesan di hefteyên yekem ên piştî ketina rejîmê di dawiya sala 2024'an de tomar kir. Ev qonax bi kaosek ewlehiyê, hilweşîna saziyî, pevçûnên rasterast, operasyonên tolhildanê û bûyerên cuda yên kuştinan hate nîşankirin. Di sala 2025'an de tundûtûjî di asta bilind de berdewam kir û Rewangeha Sûriyê li cihên cuda yên Sûrî kuştina 9 hezar û 272 kesan tomar kir. Di nav wan de hejmareke mezin a sivîlan, herwiha hêzên leşker yên cuda hebûn. Ji destpêka sala 2026'an heta îro li Sûriyê hezar û 920 kes hatine kuştin, hezar û 225 ji wan sivîl û 695 ji wan ne-sivîl in. Ev hejmar nîşan dide ku Sûriyê hîna jî bi pirsgirêkên ewlehiyê yên giran re rû bi rû ye. Herwiha tê xuyankirin ku pevçûnên leşkerî, binpêkirinên ewlehiyê û çalakiyên tolhildanê hîn jî didomin û sivîl hîn jî herî zêde buhayê van binpêkirinan didin. Di hevdîtinên Şeraa û Tramp ên lûtkeya NATO'yê de Trump soz da Şeraa ku Sûriyê ji lîsteya dewletên ku piştgirtiya terorê dike derxîne. Gelo kiriyarên ku têne kirin kî dike, ev kom di bin siya kê de ne, ji binpêkirinên



Perava Sûriyê heya Siwêda, êrişên dijî gelê Kurd li Şehba, Minbic, Bendava Tişîrnê, Kobanê piştre Şêxmeqsûd, Eşrefiyê û tevahiya Rojavayê Kurdistanê. Gelo kuştin, talankirin, koçkirina bi darê zorê û binpêkirinên bûn û hîna dibin ne ji sifetên xebata terorî ye?

### Guhertina demografîk

Yek ji girîngtirîn dosyayên kirîza Sûriyê dosyaya koçberan û guhertina demografîk a ku li ser wan tê ferzkirin, bêguman li herêmên dagirkirî ev yek bi destê dewleta Tirk û çeteyên wê tê pêkanîn, hikumeta demkî jî ji vê yekê bêbiryar e. Tevahiya herêmên dagirkirî wiha ne, li Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî, Şêxmeqsûd, Eşrefiyê, Şehba û hwd… ev yek derbasdar e. Her çiqas niştecihên resen ên Efrînê bi kelecan li benda vegera xwe ya malên xwe ne jî, divê were zanîn ku dagikeriya Tirk û komên çete hîn jî çar gundên herêma Efrîn kontrol dikin û nahêlin niştecihên wan vegerin. Ev gund Celbera û Derwîş in, her du jî li navçeya Raco ne, herwiha gundên Şiyê û Şêx Xurz corîn in. Wekî din, çend deverên din jî li herêma Efrîn hene, di nav de baregehên leşkerî li gundên Kîmar û Kefr Cenayê. Ji aliyê din ve, MÎT biryar da ku lîwaya xwe ya 62'an ku beşek ji artêşa Sûriyê ye, li peravên Sûriyeyê bi cih bike. Gelek ji çeteyên ku ji herêmê re hatine şandin berê beşdarî komkujiyên li Başûrê Sûriyê bûne. Hikûmeta demkî û MÎT'ê bi hev re, bi awayekî sîstematîk malbat û komên çeteyan ji Dêra Zorê li navendên stratejîk ên wekî Şam, Perava Sûriyê (xeta Lazkiye-Tartus) û Humsê bi cih dike, bi armanca ku serdestiya demografîk û siyasî li ser nifûsa Şîe, Elewî û Durzî bi dest bixe. Ev siyaseta bicihkirinê hema hema dubarekirinek tam a endezyariya demografîk e ku ji hêla rejîma kevin ve di bin têgeha "Sûriyek bikêrhatî" de hatiye bichkirin. Armanca hikumeta demkî guhertina avahiya nifûsê li hemî parêzgehan e, bi taybetî jî bi xurtkirina bingeha xwe ya Erebên Sunnî, "kemberek Sunnî" biafirîne.

### HRW, NY û rêxistinên mirovî çima kiriyarên derheqê gelên Sûriyê tên kirin dernaxin?

Human Rights Watch rêxistineke mirovî ya cîhanî ya parastin mafên mirovan e, li çaraliyê cîhanê nêzîkî 500 karmendên wê hene. Karmendên wê pisporên mafên mirovan pêktên, di nav de pispor, parêzer, rojnamevan û akademîsyenên ji paşxane û neteweyên cihêreng hene. Di sala 1978'an de hat damezrandin û ji wê demê ve Human Rights Watch bi lêkolînkirin, amadekirina raporên bêalî, bikaranîna bi bandor a medyayê û pir caran bi hevkariya rêxistinên mafên mirovan ên herêmî tê nasîn. Human Rights Watch salane zêdetirî 100 raporan li ser rewşa mafên mirovan li nêzîkî 90 welatan amade dike, di medyaya herêmî û navneteweyî de ev rapor deng vedidin. Human Rights Watch (HRW), 'Rêxistina Sûriyeyiyên ji bo Rasteqînî û Dadmendiyê' û 'Arşîva Sûriyeyê', di raporekê de sûcên li perava Sûriyê belge kirin. Rapor di 23'yê Îlona 2025'an hat weşandin. Tê de hate diyarkirin ku hikumeta veguhêz a Sûriyê soz dabû ji kesên destê wan di sûcên li 3 parêzgehan de hebû, hesab bixwaze. Raporê bi bîr xist ku hikumetê tenê soz da lê di pratîkê de tiştek pêkneanî. Di raporê de binpêkirinên berfireh ên ku hêzên hikumeta veguhêz û komên çekdar ên girêdayî wê kirine hatin belgekirin. Li gorî wê; înfazkirin, wêrankirina mal û milkên welatiyan û danûstandina nebaş bi girtiyan re pêkhatin. Di raporê de hat gotin ku ev sûc di çarçoveya êrişeke leşkerî ya plankirî pêk hatiye. Hemû binpêkirin di bin çavdêriya Wezareta Parastinê ya hikumeta veguhêz a Sûriyeyê de hatine kirin.

Li gorî raporê, bi destpêkirina 6'ê Adara 2025'an re hêzên hikumeta veguhêz li tevahî herêmê dest bi kiryarên tundiyê kirin. Hêzên hikumetê bi awayekî bingehîn sûc li dijî civakên Elewî pêk anîn. Ev sûc berfireh bûn û li ser bingeha nasnameyê hatin kirin. Encama rapora HRW'ê xwe dispêre girtina nerîna 100 qurbanî, çekdar û rojnamevanên şahidên bûyerê. Di heman demê de madeyên dîtbarî û bihîstinê li kêleka wêneyên udiyê yên ji rastiya wan hatiye teyîdkirin di teyîdkirinê de hatin bikaranîn. Di wan de diyar dibe binpêkirin di dema di navbera 6 û 10'ê adarê de li dijî 24 gund û bajarokan pêk hatiye.Di raporê de hate diyarkirin: "Wezareta Parastinê roleke sereke ya şandina çekdaran û kordînekirina belavbûna wan de bi cih aniye. Tevî fermandariya leşkerî dizanî binpêkirinên min hatine kirin, lê çalakiyên xwe dewam dikir." Di 22'yê Tîrmehê de "Komîtya Lêpirsînê ya Niştimanî ya Sûriyeyê" ragihand ku herî kêm hezar û 426 kes hatine kuştin. Desthilata heyî ya Sûriyeyê 298 kesên tewanbar rakirina dadgehê. Lê di rapora xwe de behsa rola berpirsên mezin di pêkanîna binpêkirina sûcan û hewldanan rêgirtina li ber wan ne kiriye. Di mijara tolrakirina kesayetî de zêde nirxandin hatibû kirin. Li hêla din di heman salê de Komîteya Lêkolînan a Neteweyên Yekbûyî (NY) li ser bûyerên meha Adara 20225'an yên li Perava Sûriyê rû dane, raporek weşand. Di raporê de bûyerên tundiyê yên ku di Adara 2025'an de li Peravê li dijî elewiyan hatine kirin, plankirî û berfireh bûn. Li gorî raporê di encama bûyerên tundiyê de 90 jê jin ku navên wan hatine belgekirin, zêdetirî hezar û 700 kes hatin kuştin. Komîteyê rapora xwe bi zêdetirî 200 hevpeyvînan û serdana gorên komî amade kiriye. Di raporê de, binpêkirin (kuştin, îşkencekirin, talankirin, şewitandina malan) ku ji aliyê hêzên hikumeta veguhêz û çekdarên alîgirên ve wê hatine kirin, wekî asta sûcên şer hatine tespîtkirin. Di raporê de bang li rayedaran hatiye kirin ku hemû tawankaran ceza bikin, gumanbaran tavilê ji kar dûr bixin û ji bo parastina civakan jî tedbîrên lezgîn bistînin. Tevger û xebata rêxistin û saziyên mirovî yên cîhanî piştî rûxandina rêjîma Baas gelekî lawaz bûye, piştî hatina hikumeta demkî komkujî, guhertina demokgrafîk, talankirin, kuştina bêserûber û hemû cûreyên binpêkirinan derheqê gelên Sûriyê de ranewestiyan. Ev yek bi rengekî biçûk ji hêla rêxistinên mafê mirovan ve hate destgirtin, komkujiyên Peravê û Başûrê Sûriyê çêbûn, raporên şermok piştî zexteke mezin ji hêla saziyên mirovî ve hatin amadekirin. Em îro dibînin ku hîna jî binpkirin derheqê gelên Sûriyê de tên pêkanîn, rêjeya kuştina bêserûber pir bilind bûye, di 6 mehan de nêzî 2 hezar kes bên kuştin ji destpêka sala 2026'an de ne hindik e, zagonên mirovî bin pê dike, yê ku vî barî hildigire û berpirsyartiyê radike jî hikumeta demkî ye. Lê saziyên wekî Human Rights Watch û Neteweyên Yekbûyî dema ku bi erka xwe ranabin, binpêkirinan tomar nakin û van kiriyaran ji cîhanê re weke ku tê xwestin dernaxin û eşkere nakin dihêlin ev sûc bêhtir bibin.

# Şoreşa 19’ê Tîrmehê: 14 salên têkoşîn û berxwedanê (2)

Di 19’ê Tîrmeha 2012’an de ku çirûska yekemîn a şoreşê li Kobanê vêket û li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû bingeha qonaxeke nû. Di 14 salan de şoreş bi xweparastin, Rêveberiya Xweser, komîn û meclisan, ziman, çapemenî û berxwedana li dijî DAIŞ û dagirkeriyê pêş ket. Îro jî, di nav pêvajoya peyman û entegrasyonê de, parastina destkeftiyên şoreşê mijarên herî girîng in.

**Amara Baran**




### Komîn û meclîs

Pergala Rêveberiya Xweser ya Demokratîk ku bi malên gel, komîn û meclisan dest pê kir û hat bi pêşxistin, gava yekemîn bi avakirina Malên Gel (2012) li herêm, bajar, bajarok û gundên rizgarkirî hat avêtin. Li wan herêman, gel bi rêya civîn û dewreyên perwerdeyê girîngiya birêvebirina xwe bi xwe di hemû aliyan de perwerde kir. Şoreşa Rojava ya ku xwe dispêre sîstema Netewa Demokratîk guhertinên mezin di aliyê civakî de hatin çêkirin. Ji bo xurtkirina tekîlêyên gelen heremê meclîs û komîn hatin avakirin. Meclîsên gel bûn xwedan rol di aliyê rêxistinkirina civakê de.

Di 13’ê adara 2015’an de jî pêngaveke nû, li Rojava û Sûriyeyê de hate destpêkirin. Di vê pêngavê de meclîsên şaredariyên gel ên bajarên Kantona Cizîrê hatin hilbijartin. Ji bo çavdêriya kar û xebatên xizmetguzariyê û peydakirina pêdiviyên welatiyan, welatiyên kantona Cizîrê bi hemû pêkhateyên xwe berê xwe dane sandoqên hilbijartinan û nûnerên xwe bi awayekî azad hilbijartin. Pêngava sereke di destpêka 2015’an de bû û li seranserî Rojavayê Kurdistanê welatiyên Rojava dest bi avakirina komînên xwe ku hucreya bingehîn a birêxistinkirina civakê ye, kirin. di avakirina komînan de hemû pêkhateyên Rojava beşdar bûn. Her wiha ji van komînan jî meclîsên gel ên gund û bajarên kantonan hatin avakirin. Van meclîsên gel jî dest bi xebatên xwe di birêxistinkirina welatiyan de li gorî sîstema netewa demokratîk ku beşdarbûna hemû beşên civakê ji bo avakirina civakeke demokratîk û azadiya rasteqîne, kirin. Rêxistinkirina komîna bû modelek li tevahiya cihanê. Ku îro li her derê dixwazin pêk bînin.

### Ji şaredariyên navendî heta rêveberiya gel

Şoreşa 19’ê Tîrmeha 2012’an ne tenê di warê siyasî de guhertinek mezin afirand, di warê xizmetên şaredariyan de jî qonaxeke nû dest pê kir. Beriya şoreşê, şaredarî bi tevahî di bin kontrola Rejîma Baas de bûn. Piraniya biryaran ji Şamê dihatin girtin, ji ber wî jî tu îradeya şaredariyan di aliyê pêşkeşkirina projeyan, û di saziyên de mafê biryardayînê tine bûn.

Di Heman demê de, di aliyê xizmetkirina gel de jî wek paqijkirina bajaran, çêkirina rê û kolanan, avakirina cihên pêwîstiyên giştî bi awayek sînordar hatibûn hîştin. Bi taybet herê zêde heremên kurdan ji aliyê xizmetguzarî ve hatibûn mehrûm kirin.

Bi Şoreşa 19’ê Tîrmehê re û bi avakirina Rêveberiya Xweser, Şarederî ji aliyê rêveberiya xweser ve carekedin nûve hat rêxistinkirin. Bi damezrandina meclîsên herêmî û komînan, xizmetên şaredariyan li gorî hewcedariyên civakê hatin plansazkirin. Paqijkirina bajaran, tamîrkirina rê û kolanan, nûkirina torên avê û kanalîzasyonê, avakirina hedîqe (park) û baxçeyan û rêxistina sûkan bûn xebatên sereke.

Ji aliyê rêxistinî de,jin bi pergala hevserokatî di rêveberiya şaredariyan de cih girtin û di biryargirtin û birêvebirina projeyan de roleke çalak lîstin. Her wiha, komîn û meclîsên gel bi beşdariya xwe di diyarkirina pêdiviyên herêmî û çavdêriya xizmetan de bûn beşek ji pergala rêveberiyê.

Her çiqas herêma Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ev 14 salin ku bi şer re rû bi rûye, rûxmê hemû rewşên zehmet û dijwar jî bê rawestan, xebatên şarederiyê domkir. daxwaz û pêwîstiyên gel ên rojane pêk anîn.

### Edalet: ji pergala navendî ber bi pergala demokratîk ve

Beriya şoreşê, pergala dadweriyê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi tevahî di destê hikûmeta navendî ya Şamê de bû. Dadgeh û saziyên edaletê li gorî qanûnên dewletê dixebitîn û gelek caran di bin bandora desthilatdariyê de diman. Welatî, bi taybetî di dozên siyasî de, rastî girtinên bêdad, darizandinên ne dadmendiya bê maf dihatin. Her wiha zimanê Kurdî jî di dadgeh de qedexebûn kesê nedikarî bi zimanê xwe, xwe bide îfadekirin.

Şoreşa 19’ê Tîrmehê ya 2012’an, yek ji gavên bingehîn ên avakirina pergala nû li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, damezrandina saziyên edaletê bû. Di 21’ê Çileya 2014’an de, pergala edaletê jî bi awayekî fermî hate saz kirin. Di vê çarçoveyê de Meclîsên Edaletê, Komîteyên Lihevhatinê û Dadgeh hatin rêxistinkirin û dest bi kar kirin. Pergala edaletê li ser prensîbên dadperwerî, parastina mafan, wekhevî û tevlîbuna civakê ava bûye.

### 2023’an de hevpeymana civakî hat nûkirin

Bi mezinbûna pergalê re di aliyê civakî, siyasî, aborî û perwerdeyê de jî nûbûn hatin çêkirin. Di 12’ê Kanûna 2023’an de Hevpeyaman Civakî ji nû ve hat nivîsandin û erêkirin. Li gorî hevpeymana nû ku ji 4 beşan û 134 xalan pêk tê, di pergala Rêveberiya Xweser de guhertin hat çêkirin û navê herêmê weke Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk hat hilbijartin. Dîsa pergala herêman (Cizîr, Firat, Efrîn) hat rakirin, kanton esas hatine girtin. Li gorî vê yekê herêm ji 7 kantonan (Efrîn-Şehba, Cizîr, Kobanê, Minbic, Reqa, Dêrazor, Tebqa) pêk tê. Li gorî Hevpeymana Civakî, qanûna yekîtiya şarêdariyan, qanûna komîseriya bilind a hilbijartinan û qanûna dabeşkirina îdarî hat derxistin.

### Zimanê kurdî

Berya Şoreşa 19’ê Tîrmehê zimanê kurdî li Sûriyê di bin siyaseta înkar û asîmlasyonê de hatibû hîştin. Rêjîma Baas bi salan siyaseta “yek netew, yek ziman” pêk anî. zimanê kurdî li her derê sûriyê hat qedexekirin. Gelek Zarokan ji ber qedexekirina zimanê Kurdî, nedikarîn bi zimanê xwe ê dayikê xwendina xwe bidomînin. Di heman wextê de mamosteyan jî, ji ber ku nedikarî bi zimanê kurdî perwerde bidin, gelek pirtûk û kovar hatin qedexekirin. Di encamê de, gelek malbat neçar bûn ku zarokên xwe bişeynin perwerdeyên zimanê Erebî.

bi destpêkirana Şoreşa 19’ê Tîrmehê re zimanê kurdî bû bingeh û li sûriyê guhertinên mezin da çêkirin. Rêveberiya xweser zimanê kurdî kir zimaneke fermî li kêlaka zimanê Erebî û Suryanî hate qebûlkirin. di hemû astan de pirtûkên kurdî hatin amadekirin, dibistanên bi zimanê Kurdî hatin vekirin û mamoste ji nû ve hatin perwerdekirin. Her weha zanîngeh û enstîtûyên zimanê Kurdî hatin damezrandin.

### Qada çapemeniyê

Wek tevhiyan beşa Çapemenî jî Berya şoreşa 19’ê Tîrmehê, li Sûriyê di bin qontrola rejîma Baas de bû. Radyo,TV û rojnameyên heyî ji aliyê rejime ve dihatin rêvebirin. hemû di bin xizmeta rejîmê de bûn. Çawa ku Zimanê kurdî xwendin û axaftin qedexebû di qada çapemeniyê de jî ev qedexeyên heyî bi awayek dijwar didomiyan. Bi pêlên şoreşê re di 2011’an de yekem dezgeha ragîhandinê Rojnameya Ronahî dest weşanê kir. Piştê wi TV, Ajans û radyo, kovar ên ku bi kurdî û erebî weşan dikirin hatin damezrandin. Şoreşa 19’ê Tîrmehê ne tenê guhertinek siyasî û civakî çêkir, di qada çapemeniyê de jî serdemeke nû dest pê kir. Çapemenî di aliyê çand û ziman de jî bû, qadeke ku gel bi awayek azad xwe tê de îfade bike. Ragihandina azad hertim destkeftiyên şoreşê parast di ragihandina rastiyê de roleke bingehîn leyîst. Ragihandin li ser bingeha pirzimanî, pirnasnameyî ku tevahiya gele heremê di nav xwe de digre hate avakirin.

Dema ku di 2014’an de DAİŞ êrîşê Kobanê û herêmên din kir, çapemenî bû yek ji amûrên bingehîn yên ragihandina rastiyan. Wêne û dîmenê berxwedana şervanan û nûyên giring ji eniya şer ragihand û raya giştî ya cîhanê agahdarkir. bi saya çapemeniyê Cîhan şahîdî ji berxwedaniya kobanê û tevahiya heremê re kir. gelek Rojnamevan ji bo ku rastiyê raghînin canê xwe kirin mertal û şehîd ketin.

FENER



Idrîs Henan

## Ji kontrola axê ber bi kontrola herikîna çavkaniyan

Pîvanê hêzê êdî ne tenê jimara tank û balafiran e, lê belê bi hejmara benderan, boriyên petrolê, rêhesin û kabloyên komînîkasyonê tê pîvan. Kî van dergeh û tengavan kontrol bike, aboriya cîhanê û biryara wê ya siyasî jî kontrol dike. Lewre jî, sedsala bîst û yekan, qirna desteserkirina dateyan, bazirganî û van rêyan e.

Îroj em bi gelek geşedanên ji hev cuda xuya dikin re ku di eslê xwe de yek tablo ne dijîn. Herêma Rojhilata Navîn ku girêka hersê parzemînên Asya, Ewrûpa û Afrîqyayê ye, bi Tengava Hurmuzê, Bab al-Mendeb, Kanala Siwês û Rojhilatê Behra Spî re bûye navenda bazirganiya enerjiya global. Çi guhertinên li wir rû bidin jî, terazûya hêza cîhanî dilerizîne.

Yek ji girîngtirîn damarên enerjiyê li cîhanê Tengava Hurmuzê ye. Lê ji ber ku li cihekî hestiyar e, her dem di bin tesîra metirsiya guhertinên leşkerî û siyasî de ye. Ev jî ji bo welatên rojavayî û asyayî bûye kêşeyek ku serê wan diêşîne. Ji ber vê yekê jî bi salan e li alternatîfekê tê gerandin ku karibe palpiştiya enerjiya cîhanî ji ser Hurmuzê kêm bike.

Li ser vê bingehê, îroj projeya ji nû ve zindîkirina korîdorên petrolê yên ji Îraqê heta Bendera Banyasê li Sûriyê bûye rojeva hegemoniya herêmî û cîhanî. Ev yek dê ji bo Îraqê avantajek be ku rêyek zêde ji bo firotina petrolê qezenc bike. Her wiha dê palpiştiya li ser Hurmuzê kêm bike, girîngiya Sûriyê ya aborî vegerîne û korîdoreke nû ya enerjiyê biafirîne. Lê ji ber ku kapasîteya wê ya veguhestina rojane ji Hurmuzê kêmtir e, nikare bibe cîgirê wê. Daneyên berdest jî nîşan didin ku Sûriyê xwedî wê avantaja cografîk a nayê înkarkirin e. Lê bingehên wê yên siyasî û aborî têrê nakin ku vê taybetmendiya wê ya cografîk veguherînin projeyekî temamkirî. Serketina vê yekê jî hewceyî aramiyeke hundirîn, gerantiya ewlehiyê, lihevkirina navxweyî, piştgirî û fînansekirina herêmî û navneteweyî ye. Her çend Tengava Hurmuzê di hevkêşeya enerjiya global de hêmanekî girîng be jî, lê realîte jî dibêje ku ew korîdora Sûriyeyê ji konseptek teorîk veguheriye projeyek cidî û ji nirxandina nexşerêyan bêtir li benda ceribandinê ye.

Ger mirov çavekî li projeyên ku tên nîqaşkirin bigerîne, dê tê bigihêje ku mesele ne guhertina cihekî bi cihekî din e, lê belê dîzaynkirina hêza hegemoniyê ya gerantiya serweriya sedsalek nû ye. Ji ber vê jî hewl dide di nav çend korîdoran de pêşbaziyê bike da ku herikîna qezencê zêde bike. Ji ber vê yekê jî, herêma Rojhilata Navîn ku navenda vê pêşbaziyê ye, li beramberî qonaxekî cuda ji dehsalên berê ye. Eger nakokiyên berê li ser kontrola ax û çavkaniyan bûn, îroj li ser kontrolkirina tevgera van çavkaniyan dizivirin. Ji lew re, girîngiya boriyan, benderan, rêhesinan, rêyên deryayî û kabloyên komînîkasyonê yên veguhestina dateyan, ne kêmtirî girîngiya artêşan e.

Di vê tabloyê de pêşbaziya hêzên ku dixwazin statuya xwe ya navenda lojîstîka cîhanî tekûztir bikin hene. Hêzên ku mecbûrin statuya xwe ji nû ve di ber çavan re derbas bikin jî hene. Lê encama tê pêşbînîkirin ew e ku pergaleke kaosê ya tevlihevtir çêbibe ku tê de gelek navendên bandorê hene. Kilîta serweriyê di destê kê de be, ew ê hêza yekdestar a hegemon be.



# Zindawerên çand û hunera Kurdî

**Can Yûsiv**

Hunermendê Şoreşger Hozan Serhed; Bilbilê Kurdistanê... Evîndarê Welat û Dengê Azadiyê.

Di demekê de ku strana Kurdî qedexe bû û axaftina bi zimanê Kurdî li gelek herêmên Kurdî wek sûnc dihate dîtin, hunermendên Kurd ên pabendîdar bi stranên xwe yên netewî û awazên xwe yên resen, roleke sereke di parastina mîrateya çandî, parastina ziman û nasnameya netewî ya Kurdî de lîstin di rûyê siyasetên înkar û tinekirinê de. Hozan Serhed yek ji berbiçavtirîn ji van pêşengan tê hesibandin, wî jiyan û hunera xwe hemû ji bo xizmeta gelê xwe û doza wî terxan kir, ew wekî stranbêjek gerok, serokê orkestrayê, lîstikvanê şanoyê, û sazvanek çalak yê amûra bağlamayê (tembûr) dihat nasîn.


Dema ku rêya têkoşînê hilbijart, ronahiya şanoyan li pey xwe hişt, di destekî de tembûra xwe û di destê din de çeka xwe hilgirt û bi wê baweriyê ku huner peyama berxwedan û parastina nasnameyê ye tevlî hevalên xwe yên li çiyê bû, ew bû dengê şoreşê, ji bo azadî û şehîdan stran digot, heya ku gihîşt asta şehadetê,di bin Ala welat de.

Hunermendê şoreşger Silêman Alp Dogan ku bi navê xwe yê hunerî “Hozan Serhed” tê nasîn, di 24ê tîrmeha 1970’an de li herêma Aleşgertê ya girêdayî parêzgeha Agirî ya Bakurê Kurdistanê, ji dê û bavek Kurd (Mihemed Îhsan û Gulsen) hatiye dunyayê û di malbateke neteweyî de ku ji şeş zarokan, du xwişk û çar bira pêk dihat, mezin bû.

Serhed di malbatê de yê herî biçûk bû ,hîn sala xwe ya yekem ne qedandibû , bavê wî jiyana xwe ji dest da, lewma malbat koçî bajarê Patnosê kir, li wir di nav şert û mercên zehmet yên civakî û aborî de mezin bû, van şertan bandoreke kûr li ser avakirina kesayetiya wî hiştin, îradeya wî xurtir kirin, û di wî de ruhê xweserî û baweriya bi xwe pêş xistin.

Ji zaroktiya xwe ve, jêhatîbûna wî ya muzîkî bi awayekî berbiçav derket holê. Di heft saliya xwe de dest bi lêdana amûra bağlama (tembûr) kir, di bin bi bandora jîngeha gelêrî ya ku tê de mezin bû, di gel bandora mîrata dewlemend a muzîka kurdî, ya tijî stranên destanî û folklorî, ev yek, bû sedema avabûna çêja wî ya hunerî û girêdana wî ya kûr bi muzîka kevneşopî ya kurdî ji salên wî yên destpêkê ve.

Hozan Serhed xwendina xwe ya seretayî û navîn li bajarê Patnosê qedand û di nîvê salên heştêyî yên sedsala borî de, dema ku di Tirkiyeyê de diyardeya stranbêjên zarok belav bû, wî yekem gavên xwe yên hunerî avêt, ji bo vê armancê çû Stenbolê, û bi alîkariya birayê xwe yê mezin, yekem kasêta xwe bi navê “Gulo” di bin navê hunerî Murad Îhsan de tomar kir, lê şert û mercên dijwar ên aborî rê nedan ku ev ezmûn bidome; ji ber vê yekê vegeriya Patnos û xwendina xwe ya lîseyê temam kir.



Di sala 1988’an de li Îzmîrê tevlî zanîngeha Îceyê ya xwendina Mûzîkê dibe û di sala 1991ê de xwendina xwe diqedîne. Di salên xwendina xwe ya zanîngehê de, têgihiştinên wî yên fikrî û hunerî berfirehtir bûn, beşeke mezin ji hewildanên xwe terxanî lêkolîna mîrata muzîkî ya kurdî, berhevkirina stranên gelêrî yên herêmên Serhed û Botanê , û lêkolîna dîroka muzîka kurdî kir, her weha hewl da ku vê mîrata dewlemend bi ruhê demê re ji nû ve pêşkêş bike, bêyî ku ji resenbûna wê tiştek kêm bike.

Wî bawer dikir ku muzîka kurdî xwedî dewlemendiyeke hunerî ye ku dikare bi bilindtirîn dibistanên muzîkê re bibe hevseng ,her weha, ew di wê baweriyê de bû ku parastina mîrata hunerî stûnek bingehîn e ji bo parastina ziman û nasnameya neteweyî ya kurdî, û veguhastina bîra çandî ji nifşekê bo nifşekî din.

Hozan Serhed di dema xwendina zanîngehê de hevalxwendekara xwe Yildiz nas dike û di 23’ê Sibata 1991’an de li bajarê Çivrilê pêre di zewice.

Bi zêdebûna aloziyên siyasî û astengiyên ku li ser çalakiyên çandî yên Kurdî hatibûn danîn, hişmendiya wî ya neteweyî bêtir pêş ket, ji lewra ew tevlî çalakiyên siyasî û çandî bû, di encama van çalakiyan de, di sala 1991’an de biryara girtinê der barê wî de hat derxistin.

Di Tîrmeha heman salê de, ew bi hevjîna xwe Yildiz re tevlî refên Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) bû. Piştî demeke kin hevjîna wî Yildiz hat girtin û 12 sal cezayê girtîgehê lê hat birîn û li girtîgeha Amasyayê hat binçavkirin, piştî vê yekê Hozan Serhed ji Tirkiyeyê derket û berê xwe da herêma Heftanînê û piştre tevlî Akademiya Şehîd Mehsûm Korkmaz li Lubnanê bû û li wir perwerdeya fikrî, rêxistinî û şoreşgerî wergirt.

Ji ber jêhatiya wî ya taybet di warê muzîkê de û ezmûna wî ya hunerî, rêberiya tevgerê ew şand Ewropayê da ku beşdarî çalakiyên çandî û hunerî bibe ,û di nava rêveberiya Hunerkomê de cihê xwe bigire, û tevlî Koma Berxwedan bû û bi rêya wê beşdarî gelek festîval û çalakiyên hunerî û çandî bû. Her weha, Hozan Serhed ezmûna stranbêjiya duetê jî bi hin ji navdartirîn hunermendên kurd re jiyand ,mîna: Tehsîn Taha, Aram Tîgran, Xelîl Xemgîn, Şivan Perwer, Xemgîn Bîrhat û Dilovan, bi hin hunermendên din re jî.

Beşdariyên wî di danasîna strana kurdî û vejandina beşeke girîng ji mîrata muzîkî ya kurdî di nav revenda kurdî de roleke berbiçav lîst, ev yeke kir, di dema ku ziman û strana Kurdî li hundirê Turkiyê rastî astengên fireh re rû bi rû bûn.

Ev hevkariyên hunerî roleke girîng di dewlemendkirin û pêşxistina ezmûna wî ya hunerî de lîstin, ev jî bû sedem ku ezmûna wî ya hunerî xurt bike û hebûna wî di qada muzîka kurdî de zêde bike.

Piştî çar salan ku li Ewropayê ma, biryar da ku vegere Kurdistanê, ew di wê baweriyê de bû ku parastina çanda kurdî û mîrata wê tenê bi xebata di nav gelê xwe de pêkan e, wî ev bawerî anî ziman û got:”Vegera welat erkeke şoreşgerî ye, û divê em vegerin koka xwe da ku îspat bikin ku çanda kurdî hîn jî zindî ye.”

Hozan Serhed di sala 1996’an de vedigere çiyayên Kurdistanê û çend mehan li herêma Zabê dimîne, paşê berê xwe dide navenda çand û hunerê ya Mezopotamyayê li bajarê Hewlerê û li wir beşdarî gelek çalakiyên çandî û hunerî dibe û di dewlemendkirina tevgera muzîka kurdî de roleke girîng dilehîze..

Piştî wê, berê xwe dide bajarê Silêmaniyê û nêzîkî sê salan li wir dimîne û di wê heyamê de bi hevkariya komek hunermendên kurd yên bijarte gelek berhemên hunerî pêktîne .

Piştî êrîşa ku di 17’ê Gulana 1997’an li dijî Navenda Çand û Hunerê ya Mezopotamya û Nexweşxaneya Birîndaran a li Hewlerê hate kirin ji hêla hêzên Tirkiya bi hevkariya hêzên Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) ê, ku di encama wê de bi dehan şehîd ketin, Hozan Serhed strana xwe ya navdar “Hawlêr” ji bo bîranîna wan çêkir, ev stran di demeke kurt de bû yek ji navdartirîn berhemên wî, û awaza wê li ser zimanê gelê kurd belav bû, heta ku cihê xwe yê taybet di bîra muzîkî ya kurdî de girt.

Hozan Serhed yek ji pêşengên herî navdar ên strana kurdî ya pabendîdar tê hesibandin ,wî di navbera afirîneriya hunerî û pabendbûna neteweyî de hevsengiyek çêkir, û strana Kurdî kir amûrek ji bo parastina mîrateya çandî, bihêzkirina nasnameya netewî û parastina zimanê Kurdî di demeke ku gelê kurd li gelek parçeyên Kurdistanê bi siyasetên înkar, paşguhkirin û binpêkirinê re rû bi rû bû ,bi vî awayî, dengê wî bû sembola azadî û berxwedanê.

Hozan Serhed ne tenê mûzîkjen û dengbêjek bû, lê hunermend, awazdêner, stranbêj û xwediyê projeyek hunerî ya yekgirtî bû.

Wî di amadekirina nifşek ji hunermendên kurd de roleke girîng lîst; ew hunermend ji ezmûna wî ya hunerî fêr bûn û ji dîtina wî ya ku muzîkê ji bo xizmeta çand û nasnameya neteweyî bi kar tîne, bandor wergirtin.

Her wiha wî rêya çend hunermendên beriya xwe şopand ,weke şehîd Sefqan, Hozan Mizgîn û Dijwar û di wê baweriyê de bû ku çand û huner yek ji girîngtirîn qadên têkoşînê ye û parastina nasnameyê ne kêmtire ji şêwazên din yên berxwedanê .

Di heyama xebata xwe ya hunerî de çend berhem pêşkêş kirin ku di bîrdanka strana Kurdî de cîhekî xurt girtibûn, yên herî diyar ev in:

- Hewlêr.
- Ax Kurdistan.
-Mizgîna Leheng.
- Payîze.
- Bîranîn.
- Şêre Şêre.
-Serbanîka.
- Sîpanê Xelatê.
- Zîlan.
- Dengê Zerdeşt.
- Çoka Serê Darê.

Ji bilî van bi dehan stranên din jî pêşkêş kir ku di navbera resenbûna mîrata kurdî û ruhê nûjenkirinê de hevsengiyek xweş çêkirin , wî muzîk kir amûrek ji bo parastina bîreweriya çandî û nasnameya neteweyî, û veguhastina mîrata gelê kurd ji nifşekê bo nifşa din.

Di 22’ê Tîrmeha sala 1999’an de, dema ku bi komek rêhevalên xwe re diçû ji bo kişandina berhemeke hunerî ya ku jiyana gerîla û xwezaya Kurdistanê li herêma Botanê belgeh bike, grop rastî kemînekê hat, piştre pevçûn derket, piştî berxwedanek lehengî hejmarek ji hevrêyên wî şehîd ketin, Hozan Serhed jî, di şer de birîndar bû, dîl hate girtin ,paşê hêzên leşkerî ên Tirkî ew bi helîkopterekê hilgirtin û ji asîmanî avêtin, û di encamê de şehîd ket , û tevlî kerwanê şehîdên azadîyê bû.

Bi şehîdbûna wî, rêwîtiya jiyanê ya hunermendekî ku tenê 29 sal jiya bi dawî bû, lê ev jiyan bi afirînerî, xebat û bexşandinek mezin dagirtî bû, û şopeke kûr di dîroka muzîka kurdî ya nûjen de hişt.

Hozan Serhed heta şehadeta xwe dilsozê hunera xwe û doza xwe ma ,ew ne tenê dengbêj bû, lê dengê şoreşê li çiyayên Kurdistanê bû, stranên wî çîrokên têkoşînê, berxwedan û hezkirina welat di xwe digirtin, ji bo azadî, ji bo gel û ji bo şehîdan distira, û bi dengê xwe êş, hêvî û xewnên netewa kurd bi awayekî bihêz nîşan dida.

Her weha, di vejandina stranên gelêrî yên kurdî de roleke girîng lîst, û wan bi ruhê serdemê re tevlihev kir ,bi vî awayî, hunera wî di parastina ziman û çanda kurdî de bandoreke mezin çêkir , û berhemên wî bûn şahidê qonaxeke girîng di dîroka strana kurdî ya pabendîdar de, û peyamek ji bo parastina nasnameya neteweyî.

Çûyîna wî nekarî hebûna wî ya hunerî bi dawî bîne ,mîrata wî di bîrdanka çanda kurdî de zindî ma, wek nîşana vê dilsoziyê, di sala 2013’an de li bajarê Silêmaniyê Koma” Şehîd Hozan Serhed “ hate damezrandin, vê komê navê wî hilgirt û ji bo vejandina berhemên wî û parastina mîrateya wî ya hunerî kar kir, bi vî awayî, Hozan Serhed bû yek ji Zindawerên dîroka çand û hunera kurdî, û sembola afirîneriya muzîkî ya pabendîdar, û dengek ku ji nifşekê bo nifşa din di bîra gelê xwe de didome.



Remezan Olçen

## Zarok zeman û ziman

Zarokatî, qonaxa herî nazik û pîroz a jiyana mirov e. Di vê qonaxê de hiş û dilê zarok wekî rûpelekî spî ye ku her gotin, her wêne û her çîrok şopeke lê dihêle. Ji bo zarokên ku bi zimanê kurmancî mezin dibin, wêje ne tenê amûreke xwendinê ye; ew di heman demê de stargehek e, pênasekirina nasnameyê ye û rêwîtiya ber bi deryaya bêserûber a xeyalan ve ye. Di nava şert û mercên dijwar ên erdnîgariya me de, edebiyata zarokan barekî dîrokî hildigire: Kewandina birînên trawmayê, geşkirina dinya xeyalan û çandina tovên mirovperwerî û welatperweriyê.

Zarokekî ku dixwîne, sînorên ku jiyana fizîkî li dorê ava kirine, radike. Wêjeya kurmancî ya zarokan divê bikaribe asoyên nû nîşanî zarokan bide. Çîrok û lehengên ku bi kurmancî dipeyivin, ji zarok re dibêjin: “Zimanê te, zimanê xeyalên herî mezin e.” Dema ku zarokek behsa qertelê li serê Çiyayê Cûdî yan jî masiyê piçûk ê di Çemê Dîcleyê de dixwîne, ew ne tenê fêrî çîrokekê dibe, ew herêma xwe, xwezaya xwe û hebûna xwe di nava hestekî estetîk de wekî perçeyekî gerdûnê dibîne. Ev yek dinya xeyalên wan ava dike û wan ji tixûbên teng ên rastiya rojane derdixe.

Edebiyat, rêya herî rastîn a fêrbûna hezkirinê ye. Ji bo zarokên Kurd, hişmendiya welat ne bi dirûşmêm hişk, lê bi hezkirina axê, çivîkên wî welatî, rûbar û çîrokên dayikan çêdibe. Zarokê ku bi rêya wêjeyê fêrî nirxê mirovbûnê dibe, wê li hemberî cîhanê bibe xwedî berpirsiyarî. Çîrokên ku tê de dostanî, parvekirin, dadperwerî û parastina xwezayê hene, hişmendiyeke kûr a mirovperweriyê di dilê wan de şîn dikin. Welatperwerî di vê wateyê de dibe hezkirina ji mirovên li ser vê axê û xwedîderketina li nirxên gerdûnî yên mirovahiyê.

Mixabin, zarokên li Kurdistanê ji ber şer, koçberî û trajediyên civakî rûbirûyî trawmayên giran dibin. Dema ku şer û tirs dengê xwe bilind dikin, edebiyat dikare bibe melhem. Wêje ji zarokan re zimanekî nû dide ku bikaribin êşên xwe bînin ziman. Çîrokên ku qala hêvî, li piyan man û derbaskirina astengiyan dikin, hîsa ewlehiyê ya windabûyî ji nû ve ava dikin. Edebiyat êşê venaşêre, lê awayê fêmkirin û rûbirûbûna bi wê êşê re nîşan dide, da ku ew trawma di hundirê zarok de nebe tirs û kînek ku jiyana wî ya paşerojê tarî bike.

Lê belê, ji bo zarokan tenê mayîna di rola “guhdar” an “xwendevan” de têrê nake. Divê edebiyat bibe çalakiyekî zindî û înteraktîf. Di vê noqteyê de, kargehên afirîner ên wêjeyî rol dilîzin. Divê hawirdorên weha werin avakirin ku zarok pênûsê bigirin destên xwe û bîranîn, hest û xeyalên xwe bi xwe binivîsin.

Kargehên ku tê de zarok çîrokan temam dikin, nameyan ji pêşerojê an paşerojê re dişînin, an jî rojnivîskên xwe ava dikin, hêza wan a derbirînê geş dikin. Dema ku zarokek bîranîna xwe ya herî xemgîn an herî şad dinivîse, ew hestên xwe kontrol dike û dibe xwediyê çîroka xwe.

Dema ku em behsa hêza bîranîn û rojnivîskê dikin, mînaka herî kûr a dîrokê Rojnivîskên Anna Frank e. Keçikeke piçûk, di nava hovîtî û tarîtiya Şerê Duyemîn ê Cîhanê de, tenê bi pênûs û deftereke piçûk karîbû ne tenê trawma û tirsên xwe bikewîne, di heman demê de dengê xwe bigihîne hemû mirovahiyê. Anna Frank bi nûçeyên rojnivîska xwe nîşan da ku pênûs ji dîtina dîwaran û tirsê bihêztir e. Ji bo zarokekî Kurd jî, nivîsandina rojnivîskekê an çîrokekê, dibe ku bibe destpêka avakirina ronahiyekê li dijî tarîtiya ku trajediyên şer anîne serê wan. Pênûs dibe amûreke berxwedanê ya hişî û derûnî.

Wêjeya zarokan a kurmancî, tenê qadeke hunerî nîne; ew avakirina paşeroja gelekî ye. Bi rêya pirtûkan, çalakiyên wêjeyî û kargehên ku pênûsê didin destê zarokan, em dikarin nifşekî bixwebawer, xwedî xeyalên mezin, mirovperwer û aştîxwaz mezin bikin. Zarokên ku hîs dikin çîrokên wan hêja ne, wê bibin afirînerên sibeheke geştir. Kewandina birînên Kurdistanê, di dil û hişê zarokan de, bi herikîna mîreka pênûsa wan dest pê dike.

# Şaredariya Tirbespiyê ji bo başkirina xizmetguzariyan xebatan didomîne

**Hevseroka Şaredariya Gel a bajarê Tirbespiyê Fehîma Temo destnîşan kir ku şaredarî ji bo pêşxistina xizmetan û bersivdayîna welatiyan bi awayekî berdewam xebatan dike û wiha got, "Em nabêjin kêmasî tune ne, lê em bi berdewamî dixebitin da ku kêmasiyên xwe çareser bikin û asta xizmetguzariyan baştir bikin."**

**Lîloz Hisên/Tirbespiyê**

Şaredariya Gel a bajarê Tirbespiyê ji bo pêşxistina xizmetguzariyên ku jiyana welatiyan pê hêsan dibe her dem di nava liv û tevgerê de ye, bi hemû beş û tîmên xwe xebatên rojane pêk tînin û ji bo pirsgirêkên heyî çareseriyan datîne. Di heman demê de tevî îmkanên sînorkirî jî ji bo başkirina jiyana welatiyan projeyên cur bi cur pêk tîne û parastina paqijiyê bajêr dike.

Derbarê mijarê de hevseroka Şaredariya Gel a bajarê Tirbespiyê Fehîma Temo ji rojnameya me re axivî.

Fehîma Temo diyar kir ku tevî zehmetî û astengiyan, şaredariya gel a bajarê Tirbespiyê bi erkên xwe yên rojana radibe û wiha anî zimna: "Bi awayekî berdewam ji bo ximzeta bajêr û şêniyên wê em xebatan dikin, lê belê serkeftina her xebateke xizmetguzarî ne tenê girêdayî şaredariyê ye, di heman demê de pêwistî bi alîkariya welatiyan jî heye, ji ber ku parastina paqijiya giştî berpirsyartiyeke hevpar e."

Fehîma Temo bal kişand ser beşên ku di nava şaredariyê de cih digrin û wiha berdewam kir: "Şaredariya Gel a Tirbespiyê ji çend beşên taybet pêk tê wekî tenduristî, jîngeh, xizmetguzarî, paqijî, zabîte, darayî, daîreya teknînk, dîwan, nivîsgeha jinê, beşê raghandinê, beşê agahdariyê, beşê agirkujê, nivîsgeha qanûnî û nivîsgeha jiyana hevbeş, her beşek ji van beşan baştirîn xizmetguzariyan ji bo welatiyan di nava pisporiya xwe pêşkêş dikin."

## Beşa tenduristiyê gerên çavdêriya meydanî pêk tîne

Fehîma Temo diyar kir ku beşa tenduristiyê bi awayekî rojane gerên çavdêriya meydanî pêk tîne û wiha lê zêde kir: "Gerên meydanî li xwaringeh, dikanên goşt, dikanên şêraniyê û salonên barberan digere, da ku bapendîbûna wan bi şertên heyî piştrast bikin, wekî din şopandina kartên tenduristiya xebatkarên ku di nava van sektoran de kar dikin."



Fehîma Temo destnîşan kir ku berî serjêkirinê û derbasbûna mirîşk û lawirên din di bazaran de bijşîkên lawiran ji bo garantiya ewlehiyê wan lênerîn dikin û wiha zêde kir: "Em hemleyên dewrî ji bo rişandina dermanê kêzikan li hemû taxan pêk tînin, ji bo ku sînorkirina belavbûna kêzikan û parastina tenduristiya gitşî."

## Paqijî û parastina jîngehê

Fehîma Temo destnîşan kir ku beşa jîngehê berpirsyartiya lênerîna parkên giştî û qadên keskayê dike û wiha got: "Wekî din beşa jîngehê bi armanca parastina dîmenê şaristaniyê yê bajêr û başkirina jînegha wê, giliyên welatiyan yên girêdayî binpêkirinên jîngehî û xebitandina ji bo çareserkirinê dişopîne. Herwiha beşa paqijiyê û xizmeguzariyê rojane kolan, tax û bazarê paqij dike, wekî din komkirin û barkriina çopê, sererastkitina toreyên kanalîzasyonê. Di heman demê de bi armanca piştgiriya tîmên paqijiyê û bilezkirina pêkanîna kar û xebatan herwiha başkirina asta xizmetguzariyan di nava bajêr de, hemleyên paqijiyê berdewam e, ne tenê kadroyên beşa paqijiyê tê de beşdar dibin, lê belê hemû xebatkar û rêveberiyên şaredariyê."

## Rêxistina bazaran

Fehîma Temo wiha gotinên xwe berdewam kir: "Rojane beşa zabîteyên di nava bazaran de gerên meydanî pêk tîne, ji bo şopandina resîfan û rêxistina tevegra bazirganoiyê, wekî din kontrolkirina binpêkirina û girtina tedbîrên qanênî derheqê kesên muxalfe dikin ji bo misogerkriina parastina sîstema gitşî. Di heman demê de beşê darayî berpirsyarê rêvebirina berhevkirin, hawirdekirin, dahat û mûçeyan e, lê belê dayîreya tekînkî derxistina destnûrnameyên ji bo avakirin, şopandina projeyan, çavdêriya xebatên avakirinê û piştrastkirina pêkanîna wê nli gorî sîstemên pejiranî îdare dike.



Beşa dîwanê jî nameyên fermî, arşîf û pêşwazîkirina daxwaz û giliyên welatiyan rêxistin dike, herwiha nivîsgeha jinê ji bo piştgiriya jinê û xurtkirina rola wê ya aborî û civakî xebatan dike, digel çavêdriya li ser nangeha Rojava, pêkanîna projeyên taybetî jinê wekî ji nû ve sererastkitina Çerxerêya Azadî.

Beşa ragahandinê jî çalakiyê şaredariyê belge dike herwiha nûçe û raporan amade dike û daxuyaniyan di rêya rûpela fermi ya şaredariyê belav dike. Di heman demê de beşa agahdariyê pêşwaziya welatiyan dike û tevgera lêvegeran rêxistin dike. Wekî din beşa agirkujê ji bo bersivdayîna bûyerên agir di nava bajêr de û di demsalên çinînê de. Derbarê nivîsgeha qanûnî ew berpirsyartiya amadekirina hevpeymanan û biryarên girêdayî dozên qanûnî dike, herwiha nivîsgeha hevjiyanê muameleyên peymanên zewacê û yên jiyana hevbeş dişopîne."

## Sala 2025'an 12 proje hatin pêkanîn

Fehîma Temo diyar kir ku di sala 2025'an de şaredariyê 12 projeyên xizmetguzarî pêkanîn, di nav de ziftkirina çend kolanan, digel pêkanîna projeyên sererastkirina rêyan bi armanca başkirina toreya veguhestinê di nava bajar de û wiha berdewam kir: "Komeke ji projeyên sala 2026'an em berdewam dikin, ji van projeyan berfirehkirina pilana rêxistinî ya bajar e, avakirina bajarê pîşesazî, ji nûve sererastkirina çerxerêya Azadî, pêkanîna qeşirandina kolana giştî bi hevkariya kompaniya Şemal. Di heman demê de şaredaariy buhayê bi qasî 300 hezar dolar girt ji bo ji nûve sererastkirina kolanan, lêbelê, rêjeya pêwistiyên heyî ji îmkanan pir zêdetir e. Ji ber vê yekê, em li gorî pêşîniyan û îmkanên berdest li ser pêkanîna projeyan dixebitin."

## Beşê paqijiyê

Şaredariya gel a bajarê Tirbespiyê pêkanîna hemleyên paqijkirina kolan, bazar û taxan berdewam dike, lê parastina paqijiyên berpirsyartiyeke hevbeş di navbera şaredariyê û welatiyan e, Fehîma Temo wiha derbarê vê yekê got: "Mixabin em hin cihan zêdetirî carekê paqij dikin, lê belê demeke kurt e dîsa vedgere wekî berê, ev yek jî dem û hewldanê dixwe û gihîştina xizmetên paqijiyê ji bo deverên din ên ku pêdivî bi wan heye dereng dixe, ji ber vê yekê em her gav berî ku em muxalefatan bidin, hişyarî û hevkariyê tercîh dikin. Nûjenkirin û ziftkirina rêyan di nav daxwazên sereke yên welatiyan de ne. Şaredarî hewl dide ku hejmareke mezin ji projeyên ziftkirinê bicîh bîne, lê çavkaniyên darayî yên sînorkirî nahêlin ku hemû proje di carekê de werin bicîhanîn. Ji ber vê yekê, kar gav bi gav û li gorî pîvanek ji pêşanîyan tê kirin."

## Pilanên pêşerojê

Hevseroka Şaredariya Gel a bajarê Tirbespiyê Fehîma Temo di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku şaredarî komek ji zehmetiyan dibîne, di nav de qelsbûna hevkariya hin welatiyan di parastina paqijiya giştî, dar û milkên giştî de û wiha bi dawî kir: "Wekî din kêmanî di alav û amûran de heye, bilindbûna lêçûna sotemeniyê ji ber kirîna wê ji bazara serbest, ku ev yek li ser lezbûna pêkanîna projeyan û xebatên xizmetguzriyê, nîşan dide. Şaredariya Tirbespiyê ji bo pêşxistina xizmetan û bersivdayîna welatiyan bi awayekî berdewam xebatan dike, em îdiaya bêkêmasiyê nakin, lê em bi berdewamî dixebitin da ku kêmasiyên xwe çareser bikin û asta xizmetguzariyan baştir bikin. Di nav pêşîniyên me de nûjenkirina rêyan, berfirehkirina projeyên ziftkirinê, balkişandina ser paqijiyê û parkan û pêkanîna projeyên nû yên ku hewcedariyên bajêr pê hene."



# 'Qanûnên sûcdarkirin, teslîmbûn û bi navê efûyê nayên qebûlkirin'

**Hevberdevkê Înîsiyatîfa Yekîtiya Demokratîk û Parlamenterê Amedê Mehmet Kamaç diyar kir ku pêvajoya aştiyê gihîştiye xala girîng a gavên qanûnî, derengxistina van qanûnan wê baweriya gel bi dewleta Tirk biqedîne, yasayên bên derxistin jî divê berisva pêvajoyê bidin, qanûnên sûcdarkirin, teslîmbûn û bi navê efûyê jî nayên qebûlkirin.**

**Ronahî Sadûn**

## Dema gav avêtina dewletê ye û ev gav bi guhertina qanûnan dest pê dike

Rêber Apo di sala 2025'ân de, ku ev salake zêdetire Banga Aştî û Civaka Demokratîk, kiriye. Hewcedarî pê heye ku dewleta Tirk gavêtinên girîng bavêje. Her çend dewleta Tirk bi xwe ket rêya vê pêvajoyê û daxwaz ji Rêber Apo kir ku vê banga dîrokî bike, dîsa jî bi awayekî cidî û rast ji bo pêşvebirina pêvajoyê tev nagere. Gavên destpêkê yên ku ji bo meşandina pêvajoyê dihatin xwestin, ji aliyê Rêber Apo û Tevgera Azadiyê ve yek bi yek hatin avêtin. Li hember van gavan, ji dewleta Tirk jî hat xwestin ku gavên pêwîst bavêje, da ku pêvajo bi hevsengî û bi hev re bimeşe û bibin bingeha serkeftinê. Lê heta niha Tirkiyê zêdetir li benda Tevgera Azadiyê maye ku hemû gavên pêwîst bi tenê ew bavêje. Bendewariya dewletê ew e ku PKK têkoşîna xwe ya 50 salî di kêliyekê de bidawî bike, çekên xwe radest bike û gerîla ji çiyayên Kurdistanê derkeve bêyî ku garantiyên qanûnî pêk bîne, herwiha mafê hêviyê ji bo Rêber Apo pêk neyne, qanûnên demokratîk neyên nivîsandin û Komara Tirkiyê demokratîk nebe. Lê ne Rêber Apo û ne jî Tevgera Azadiyê vê nêzîkatiyê qebûl dikin. Ji ber ku bi vê zihniyetê re aştiya rastîn pêk nayê, mafên gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê nayên misoger kirin û pirsgirêka Kurd li Tirkiyê jî çareser nabe. Lewra jî guhertina qanûnan û nivîsandina wan li ser bingeha demokratîk, guhertina zihniyeta dewleta Tirk, pêkanîna mafê hêviyê, azadiya girtiyên siyasî, demokratîkkirina Komara Tirkiyê û gavên din ên demokratîk ji daxwazên sereke ne ku divê bi lez ji aliyê dewlet û Meclisa Tirkiyê ve bên avêtin.

## Ji berxwedana çekan ber bi berxwedana siyasî û qanûnî ve

Çima em dibêjin ku divê qanûn werin nivîsandin û demokratîkbûn li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê were misoger kirin? Bersiva vê yekê di cewherê Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de ye. Ev pêvajo ji qonaxa berxwedana çekdarî derbasî qonaxa têkoşîna siyasî bûye. Ev jî tê vê wateyê ku ji vir û pê ve şer û çek ne amûra sereke ya çareserkirinê ne, lê divê têkoşîna siyasî, muzakere û reformên qanûnî rê li ber guhertinên demokratîk vekin. Ji bo ku ev qonaxa nû bi serkeftî pêş ve here û armancên wê bên pêkanîn, pêdivî bi guherandin û nivîsandina qanûnên nû heye. Lê girîngtirîn pirs ew e ku ev qanûn divê bi çi rengî bin û li ser kîjan bingehan werin amadekirin? Qanûnên ku di çarçoveya vê pêvajoyê de bên nivîsandin nabe ku tenê li gorî daxwaz, berjewendî an nêrîna dewleta Tirk an jî kesekî taybet werin amadekirin. Ger qanûn bi vî rengî werin çêkirin, ew nikarin bersivek rast bidin hewcedariyên civakê û armancên pêvajoyê. Di şûna vê de, divê ev qanûn guhertinên bingehîn di warê maf, azadî, wekhevî û demokratîkbûnê de pêk bînin û bingeha siyasî û qanûnî ya pêvajoyê bihêz bikin. Herwiha divê ew pirsgirêkên ku bi dehê salan bûne sedema şer û aloziyê û têkoşîna tevgerê li hemberî wê hatiye maşandin, bi awayekî rast û dadperwer çareser bibin. Armanca çareserkirinê ne tenê rêvebirina qonaxa niha ye, lê avakirina bingehekî domdar ji bo aştî û demokratîkbûnê ye. Ji ber vê yekê amadekirina van qanûnan divê bi pêşengtiya muzakerevanê sereke yê pêvajoyê Rêber Apo di nav çarçoveya muzakere û lihevhatinê de bi dewletê re, were meşandin. Tenê bi vî rengî dikare qanûnên ku hem bi ruhê pêvajoyê li hev tên, hem jî bersivê didin daxwaz û mafên gelan, werin avakirin. Ev jî şertê sereke ye ji bo ku Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi serkeftî bigihîje encamê û demokratîkbûn li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê bi awayekî rastîn, were misoger kirin.

Derbarê xebatên Meclisa Tirkiyê ji bo gavavêtina gavên pêwîst ji pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk re, herwiha nivîsandina qanûnan, Hevberdevkê Înîsiyatîfa Yekîtiya Demokratîk û Parlamenterê Amedê Mehmet kamaç ji Rojnameya me re axivî.



## 'Pêvajo gihîştiye xala girîng a gavên qanûnî'

Mehmet Kamaç diyar kir ku ji destpêka pêvajoyê heta niha gavên dewleta Tirk bi giranî tên avêtin û wiha got: "Mixabin ji roja destpêka pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk heta niha desthilata Tirkiyê her dem bi giranî tevdigere. Helbet ev helwest ne li gorî girîngiya pêvajoyê ye. Lê tevî gelek astengiyan, pêvajo gihîştiye xaleke herî girîng. Ev xala girîng a gavên qanûnî ne. Pêwîst e desthilat pêşnûmeya qanûnî bi aktorên sereke yên pêvajoyê û bi parlamentoyê re parve bike. Divê ev pêşnûme di parlamentoyê de were nîqaşkirin û wek qanûn were pejirandin. Rola parlamentoyê jî ew e ku komîsyona ku hatibû avakirin û li ser navê parlamentoyê xebitî û di encamê de raporek hevpar amade kir, xwedî li vê xebatê derkeve û bandorê li ser desthilatê bike. Lê belê em dikarin bêjin ku ne desthilatê girîngiyek têkildar nîşan daye û bi vê girîngiyê nêz dibe, ne jî parlamentoyê karîye bandorek li ser desthilatê çêbike. Astengiya herî mezin jî ev rewşa heyî ye."

## 'Derengxistina qanûna wê baweriya gel bi dewleta Tirk biqedîne'

Mehmet Kamaç di dewamiya axaftina xwe de eşkere kir ku baweriya gel bi dewleta Tirk di asta jêrîn de ye, derengxistina qanûnan jî wê baweriya gel bi dewleta Tirk biqedîne û wiha bilêv kir: "Wekî tê zanîn di nav gel de baweriya li ser pêvajoyê di asta herî jêrîn de ye. Ev ne bawerî, ne li ser Tevgera Azadî ye, lê li ser dewlet û desthilata Tirkiyê ye. Di gel vê yekê hêviyeke mezin di nav gel de hebû. Ji ber ku rayedarên desthilatê, Serokkomar û Serokê Parlamentoya Tirkiyê dibêjin ku beriya betlaneyê yasa dê were derxistin. Heke ev yasa neyê derxistin, ev ê bi temamî baweriyê tune bike û hêviyê jî biqedîne. Herwiha heke beriya betlaneyê yasa neyê derxistin, dê niyeta wan a rast di aliyê neyînî de were dîtin."



## 'Divê yasayên bên derxistin berisva pêvajoyê bidin'

Kamaç tekez kir ku yasayên bên derxistin divê bersiva pêwîstiyên pêvajoyê bidin û wiha anî ziman: "Bi rastî em gelek caran tînin ziman û her dem balê dikişînin ku yasaya ku derkeve divê bersiva pêdiviyên pêvajoyê bide. Yasa divê ne li gorî daxwaz an jî hestyariyên aliyekî were amadekirin. Divê li gorî rastiya muzakereyên her du aliyan bê amadekirin û di heman demê de razîbûna gel jî li ser hebe. Hêvî û baweriya civakê divê bi vê yasayê careke din were avakirin. Ji ber ku ev yasa dê pêngavên ku heta niha hatine avêtin bi wate bike û bi firehî bibe çavkaniya yasayên çareseriyê."

## 'Qanûnên sûcdarkirin, teslîmbûn û bi navê efûyê nayên qebûlkirin'

Kamaç destnîşan kir ku qanûnên wekî sûcdarkirin, wekî teslîmbûnê were şîrovekirin an jî bi navê "efûyê" bêne pênasekirin, ew nabe û nayên qebûlkirin jî û wiha domad: "Gotinên ku li ser qanûnên têkildarî Tevgera Azadiyê lli hin medyayên civakî belav dibin, heta niha ne pêşnûmeyek fermî ne. Lê em dikarin bêjin ku eger Tevgerek bi îradeya xwe ya azad xwe fesih bike û dixwaze ku tekoşîna xwe bi rêyên demokratîk berdewam bike, divê qanûnên ku dê derkevin pêşiya vê Tevgerê veke. Qanûnên ku wekî sûcdarkirin, wekî teslîmbûnê were şîrovekirin an jî bi navê "efûyê" bêne pênasekirin, ew nabe û nayên qebûlkirin jî. Ji ber vê yekê divê di derbarê qanûnên têkildarî Tevgera Azadiyê de hestyarîyek mezin hebe. Nêzîkbûn divê bi rêzdarî û bi rûmet be. Aştiyek bi rûmet tenê bi van rastiyan mimkin dibe. Eger ev hestyarî nehatin berçavgirtin, pêvajo pêşve naçe û gihîştina serkeftinê jî ne mimkine."

## 'Divê Parlamentoya Tirkiyê berpirsyariya xwe ya dîrokî bicih bîne'

Hevberdevkê Înîsiyatîfa Yekîtiya Demokratîk û Parlamenterê Amedê Mehmet kamaç axaftina xwe wiha qedand: "Bi rastî jî pêvajo fersendeke dîrokî ye. Yek alî be jî, bi biryardarî, îradeyeke xurt û cesaret di bin pêşengtiya Rêber Abdullah Ocalan de, çend pêngavên girîng hatin avêtin û bi wan pêşiya serkeftina vê pêvajoyê hat vekirin. Gere ev rastî bê bersiv nemîne. Bersiva van pêngavan divê Parlamentoya Tirkiyê bide. Van pêngavan rê ji bo Parlamentoya Tirkiyê vekirine û divê Parlamento di vê rê de bi meşe. Ew jî divê bi biryardarî û cesaret pêngavan bavêje, çavkaniya hemû pirsgirêkên Tirkiyê ku pirsa Kurd e çareser bike û pêşiya demokratîkbûna Tirkiyê veke. Ji ber ku Parlamento sîwana demokrasiyê û zemîna çareseriyê ye. Ev jî berpirsiyariya dîrokî ya Parlamentoya Tirkiyê ye."

# Civîna Bilind a NATO'yê û guhertinên jeopolîtîk li Rojhilata Navîn (1)


Yunis Bahram

Çend sal in, pergala navneteweyî di nav veguherînên kûr de ye ku pêşîniyên ewlehî û siyaseta cîhanî ji nû ve xêz kirine. Şerê Rûsya-Ukraynayê, pêşbaziya stratejîk a zêde di navbera Dewletên Yekbûyî û Çînê de, rageşiya berdewam di navbera Washington û Tehranê de û pêşketinên bilez ên li Rojhilata Navîn hemû beşdarî ji nû ve şekilkirina şêweyên hevpeymanî û hevsengiyên herêmî û navneteweyî bûne.

Di vê çarçoveyê de, krîzên li Rojhilata Navîn êdî wekî pevçûnên herêmî yên îzolekirî nayên famkirin, lê belê wekî beşek ji pêşbaziya di navbera hêzên mezin de ji bo bandor, çavkanî û korîdorên stratejîk in. Rewşên li Sûriye, Iraq û Deryaya Spî ya rojhilat wekî qadên ku berjewendiyên ewlehî û siyasî yên hejmarek aktorên herêmî û navneteweyî li hev dicivin, derdikevin pêş.

Civîna Bilind a NATOyê di vê dîmenê de ne tenê wekî platformek ji bo hevrêzkirina polîtîkayên parastinê di navbera dewletên endam de, lê di heman demê de wekî nîşaneyek ji nêzîkatiya hevpeymaniyê ji bo rûbirûbûna pirsgirêkên ewlehiyê yên pêşkeftî girîngiyek taybetî bi dest dixe. Her çend Rojhilata Navîn ne mijara sereke ya rojeva lûtkeyê bû jî, pêşketinên herêmî bandorek rasterast li ser jîngeha ewlehiyê ya hevpeymaniyê dikin, nemaze ji ber cihê jeostratejîk ê Tirkiyê ku Ewropayê bi Rojhilata Navîn û Deryaya Reş ve girêdide.

Ji vê perspektîfê, ev lêkolîn hewl dide ku pozîsyona Tirkiyeyê di pêşbaziya di navbera hêzên mezin de, bandorên guhertinên jeopolîtîk li ser pirsgirêka Kurd û têkiliyên herêmî yên ku pêşeroja herêmê şekil didin, analîz bike.



### Rojhilata Navîn di qonaxek ji nû ve şêwekirinê de

Rojhilata Navîn di qonaxek veguhêz de derbas dibe ku ji krîzên kevneşopî derbas dibe, ji ber ku têkiliyên herêmî bi veguherînên ku di nav pergala navneteweyî de çêdibin re her ku diçe bi hev ve girêdayî ne. Daketina yekqutbî û derketina hêzên navneteweyî û herêmî yên nû bûne sedema ji nû ve şekilkirina hevsengiyên hêz û hevpeymanan. Di vê çarçoveyê de, pirsgirêkên ewlehî, enerjî, aborî û koçberiyê bi fikarên leşkerî ve girêdayî ne, ku herêmê dike yek ji qadên herî hesas ên pêşbaziya navneteweyî. Nakokiyên li Sûriye, Iraq û Deryaya Rojhilat êdî ne tenê mijarên navxweyî ne. Ew bûne dosyayên ku berjewendiyên Dewletên Yekbûyî, Rûsya, Çîn û hêzên Ewropî, ligel aktorên herêmî yên wekî Tirkiye, Îran, Îsraîl û welatên Kendavê li hev dicivin.

Wekî din, pêşketinên dawî, di nav de rûbirûbûna nerasterast a berdewam a di navbera Dewletên Yekbûyî û Îranê de, bandorên şerê Rûsya-Ukraynayê, û veguherînên ku li ser dîmena Sûriyeyê têne dîtin, girîngiya Rojhilata Navîn di hesabên stratejîk ên hêzên mezin de xurt kirine, û herêmê dikin namzetek muhtemel ji bo ji nû ve rêzkirina hevpeymanan di salên pêş de.

### Civîna Bilind a NATO' yê û pîvanên wê yên stratejîk

Her çend rojeva civîna bilind a NATOyê bi giranî li ser ewlehiya Ewropayê, xurtkirina şiyanên parastinê yên hevpeymaniyê, û piştgiriya berdewam ji bo Ukraynayê sekinî, bandorên civîna bilind ji çarçoveya Ewropayê derbas bûn da ku hawîrdora ewlehiyê ya li Rojhilata Navîn jî bigire nav xwe.

Pirsgirêkên têkildarî terorîzmê, ewlehiya enerjiyê, koçberiya bêserûber, û aramiya aliyê başûr ê hevpeymaniyê hîn jî mijarên ku rasterast bandorê li pêşîniyên NATOyê dikin in. Ji ber vê yekê, her pêşketinek li Rojhilata Navîn, nemaze li Sûriye, Iraq û Deryaya Rojhilat, bi awayekî nerasterast bandorê li hesabên stratejîk ên welatên endam dike. Ji vê perspektîfê ve, Tirkiye yek ji endamên herî girîng ên hevpeymaniyê ye, ne tenê ji ber şiyanên xwe yên leşkerî, lê di heman demê de ji ber cihê xwe yê erdnîgarî jî, ku wê dike xalek girîng di navbera Ewropa, Asya û Rojhilata Navîn de. Ev cih di heman demê de rolek navendî dide wê di şerê li dijî terorîzmê, ewlehiya sînor, enerjî û rêveberiya koçberiyê de - hemî mijarên girîng ji bo ewlehiya Ewropayê.

Tirkiye di navbera hevpeymaniya Atlantîk û xweseriya stratejîk de

Ji dema ku di sala 1952an de tevlî NATOyê bû, Tirkiye kevirê bingehîn ê baskê başûr ê hevpeymaniyê ye, û pozîsyona xwe ya jeopolîtîk bikar tîne da ku bandorê li hejmarek mijarên herêmî û navneteweyî bike. Di du dehsalên borî de, Enqerê siyasetek derve ya serbixwetir pejirand, û hewl da ku hevkariya xwe ya berdewam bi Rojava re bi berfirehkirina têkiliyên xwe bi hêzên din ên herêmî û navneteweyî re, bi taybetî Rûsyayê re, hevseng bike, di heman demê de hebûna xwe li Rojhilata Navîn, Qefqasya û herêma Deryaya Reş jî xurt bike.

Ev meyl di gelek waran de xuya bûye, di nav de kirîna pergala parastina hewayî ya S-400 ya Rûsyayê û beşdariya rasterast di hejmarek krîzên herêmî de, di heman demê de hevkariya leşkerî û ewlehiyê bi hevalbendên xwe yên NATOyê re li ser mijarên din berdewam dike.

Biryarderên li Enqerê bawer dikin ku ev rêbaz nermbûnek mezintir peyda dike da ku berjewendiyên neteweyî biparêze û şiyana wan a manevrayê di hawîrdorek navneteweyî ya ku her ku diçe reqabet dibe de zêde bike. Berevajî vê, hin hevalbendên Tirkiyê yên NATOyê vê siyasetê wekî çavkaniyek ji bo pirsgirêkên nû di nav hevpeymaniyê de dibînin, nemaze dema ku berjewendiyên Tirkiyê bi pêşîniyên hevalbendên Rojavayî re li ser hin mijaran li hev dikin.

Digel vê yekê, Tirkiye hêmanek girîng a mîmariya ewlehiya Atlantîkê dimîne, çi ji ber cihê xwe yê erdnîgarî, şiyanên xwe yên leşkerî, an jî rola xwe di rêvebirina gelek mijarên têkildarî ewlehiya Ewropî û herêmî de. Ev yek têkiliya di navbera Enqerê û NATOyê de dike tevlîheviyek tevlihev a hevkariya stratejîk û nakokiyên siyasî.

### Pirsa Kurd di navbera nirxandinên ewlehiyê û mafên siyasî de

Pirsgirêka Kurd yek ji pirsgirêkên herî tevlihev ên Rojhilata Navîn dimîne, ji ber tevliheviya aliyên wê yên dîrokî, siyasî û ewlehiyê, û gihîştina wê ya erdnîgarî li seranserê Tirkiye, Sûriye, Iraq û Îranê. Wekî din, polîtîkayên cihêreng ên ku van welatan li hember welatiyên xwe yên Kurd dimeşînin, digel şert û mercên navxweyî yên cûda yên her yekê, çareserkirina pirsgirêkê wekî mijarek yekgirtî an homojen dijwar kiriye.

Ji perspektîfa Tirkiyeyê ve, şerê li dijî Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) pêşîniyek ewlehiyê ye. Enqere PKK wekî rêxistinek terorîst dabeş dike û her sazî an avahiyên ku ew pê ve girêdayî dibîne wekî gef li ser ewlehiya xwe ya neteweyî, nemaze li herêmên sînor ên bi Sûriye û Iraqê re, dibîne.

Berevajî vê, beşên hêzên siyasî yên Kurd û rêxistinên civaka sivîl bawer dikin ku pirsa Kurd nikare tenê bi aliyê wê yê ewlehiyê ve were kêm kirin. Ew dibêjin ku ew bi mijarên hevwelatîbûna wekhev, mafên çandî û zimanî, beşdariya siyasî, pêşkeftin û serweriya qanûnê ve jî girêdayî ye. Ev perspektîf li ser bingeha wê ye ku bidestxistina aramiya domdar nêzîkatiyên siyasî û sazûmanî li kêleka tedbîrên ewlehiyê hewce dike.

Ev perspektîfên cuda bûne sedema berdewamiya aloziyê di çareserkirina vê pirsgirêkê de, hem li hundir û hem jî di çarçoveya têkiliyên herêmî û navneteweyî de. Pirsa Kurd bûye yek ji wan dosyayan ku tê de fikarên ewlehiyê bi hevsengiyên jeopolîtîk ên li Rojhilata Navîn re li hev dikevin.

### Bakur û Rojhilatê Sûriyê… Berjewendiyên herêmî û navneteweyî yên hevbeş

Şerê Sûriyê rastiyek nû ya siyasî û ewlehiyê derxistiye holê, ku bi derketina holê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê wekî yek ji aktorên herêmî yên herî berbiçav li deverên li derveyî kontrola hikûmeta navendî tê temsîlkirin.

Ev rêveberiyê di dema şerê li dijî DAIŞê de girîngiyek zêde bi dest xist, ji ber ku Hêzên Demokratîk ên Sûriyeyê (SDF), bi piştgiriya Dewletên Yekbûyî û hevpeymaniya navneteweyî, di operasyonên leşkerî de hevkarî kirin ku armanc dikirin kontrola rêxistinê li ser deverên mezin ên Sûriyeyê bi dawî bikin.

Lêbelê, vê rastiyê di têkiliyên navneteweyî de hevkêşeyek tevlihev çêkiriye. Ji aliyekî ve, Dewletên Yekbûyî û hevkarên wê hevkariya bi SDF re wekî beşek ji stratejiya xwe di şerê li dijî DAIŞê de hesibandin. Ji aliyê din ve, Tirkiyeyê fikarên xwe li ser têkiliyên di navbera hin hêmanên van hêzan û Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) de anî ziman, ku bandor li polîtîkayên wê yên ewlehî û leşkerî li bakurê Sûriyeyê kiriye. Di encamê de, bakur û rojhilatê Sûriyê bûye yek ji qadên herî hesas ên pêşbaziyê li Rojhilata Navîn, ku berjewendiyên Dewletên Yekbûyî, Tirkiye, Rûsya, Îran û hikûmeta Sûriyê li hev dicivin. Ev yek her guhertinek di hevsengiya hêzê ya herêmî an navneteweyî de rasterast bandorê li ser pêşeroja herêmê dike.

### Sûriye… Qadeke pêşbirka bandore

Krîza Sûriyê êdî tenê wekî pevçûnek navxweyî nayê dîtin. Ew bûye yek ji qadên herî berbiçav ên pêşbaziyê di navbera hêzên herêmî û navneteweyî de, ku tê de fikarên ewlehiya neteweyî bi berjewendiyên jeopolîtîk re têkildar dibin.

Ji destwerdana leşkerî ya Rûsyayê di 2015an de, Moskowê karî hebûna xwe ya leşkerî û siyasî li Sûriyê xurt bike, û di pêvajoya pevçûnê de rolek bi bandor daye wê. Lêbelê, bandorên şerê li Ukraynayê ji bo şiyana wê ya veqetandina çavkaniyan û çareserkirina pirsgirêka Sûriyê bi heman tundiya salên berê re bûye sedema pirsgirêkên nû.

Berevajî vê, Îran berdewam dike ku Sûriyê wekî hêmanek sereke di stratejiya xwe ya herêmî de bibîne û hewl dide ku bandora xwe ya siyasî û leşkerî bi rêya toreke hevalbendên herêmî û herêmî biparêze. Di heman demê de, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê balê dikişîne ser pêşîgirtina ji nû ve vejîna DAIŞê û sînordarkirina mezinbûna bandora Îranê, di heman demê de hebûna leşkerî ya sînorkirî li rojhilatê Sûriyeyê diparêze.

Ji aliyê xwe ve, Tirkiye ewlehiya sînorê xwe yê başûr wekî pêşîniyek stratejîk dibîne û îdia dike ku polîtîkayên wê li bakurê Sûriyeyê ji ber sedemên ewlehiya neteweyî û pêwîstiya pêşîgirtina li avakirina saziyên ku ew bi rêxistinên ku ewlehiya wê tehdît dikin ve girêdayî ne, derdikevin. Bi vî awayî, Sûriye bûye qadeke ku gelek projeyên herêmî û navneteweyî lê digihîjin hev, ku ji hev veqetandina pêşketinên navxweyî ji hesabên hêzên derve dijwar dike.

### Reqabeta DYA-Îranê û bandorên wê yên herêmî

Tevî nebûna pevçûnek leşkerî ya rasterast û berfireh di navbera Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îranê de di dehsalên borî de, têkiliya di navbera her du welatan de bi rewşek domdar a pêşbaziya stratejîk ve hatî xuyakirin, ku di cezayên aborî, zexta dîplomatîk, pevçûnên nerasterast û pêşbaziya ji bo bandorê li çend welatên herêmê de diyar dibe.

Bandora vê pêşbaziyê digihîje Iraq, Sûriye, Lubnan û Yemenê, ku her aliyek piştgirî dide hevalbend û hevkarên herêmî bi awayekî ku xizmeta vîzyona wê ya hevsengiya hêzê ya herêmî dike.

Ji bo Washingtonê, sînordarkirina bandora Îranê, misogerkirina ewlehiya hevkarên xwe yên herêmî û şerê li dijî rêxistinên tundrew stûnên bingehîn ên siyaseta xwe ya Rojhilata Navîn in. Tehran, ji aliyê xwe ve, parastina tora têkiliyên xwe yên herêmî wekî hêmanek sereke ya parastin û astengkirina stratejîk dibîne.

Bi vê dînamîkê, her aloziyek di navbera her du aliyan de dê bandorê li ser hevsengiya giştî ya hêzê li Rojhilata Navîn bike, di nav de rewşên li Sûriye û Iraqê, pêşeroja pirsgirêka Kurd û pêşîniyên siyaseta ewlehiyê ya Tirkiyê…...



# Rêwîtiya 8 salan a koçberiyê bi dawî bû

Gelê Efrînê ku di sala 2018'an de ji ber êrişên dewleta Tirk bi darê zorê ji warê xwe hatibû koçberkirin, rastî pêvajoyeke pir giran û bi êş hat. Koçberiya yekem ne ya dawiyê bû; gelê Efrînê ji ber êrişên cuda di nava 8 salan de 4 caran rastî pêlên koçberiyê hatin. Lê belê, bi peymana 29'ê Çileyê re deriyê vegerê vebû û rêwîtiya 8 salan a di nava koçberiyê de bi dawî bû.

Aryen Hesen

Gelê Efrînê di sala 2018'an de, ji ber êrişên dijwar ên dewleta Tirk û komên çekdar, bi darê zorê ji ser cih û warên xwe hat koçberkirin. Lê belê, ev ne koçberiya wan a dawiyê bû; gelê Efrînê ji ber êriş û rûdanên cuda, 4 caran rastî pêlên koçberiyê hat. Ev 8 salên koçberiyê bi êş, keser û zehmetiyên mezin derbas bûn. Tevî vê yekê jî, berxwedanî û hêviya gel a ji bo vegerê, her tim ji hemû zehmetiyan bihêztir bû. Di encamê de, ev rêwîtiya koçberiyê ya bi darê zorê, bi peymana 29'ê Çileya 2026'an re bi dawî bû û deriyên vegera li ser axa xwe hatin vekirin.



### Bi armanca têkbirina destkeftiyên Kurdan, dewleta Tirk Efrînê dagir kir

Efrîn bajarekî Rojavayê Kurdistanê ye ku bi xweza û çandiniya xwe bi nav û deng e. Herêm xwedî avhewayeke guncav û axeke dewlemend e; herî zêde jî bi darên xwe yên zeytûnê û zeyta xwe ya bêhempa tê naskirin. Lê belê, ev bedewî û xêr û bereketa herêmê ji ber planên dewleta Tirk kêm bûn; bi koçberkirina xelkê Kurd re axa Efrînê xemgîn bû û êdî wekî berê berheman nade.

Dagirkirina Efrînê di sala 2018'an de, bi plansaziya dewleta Tirk û bi alîkariya komên çete yên ku navê "Artêşa Niştimanî" li xwe dikin, pêk hat. Di heman demê de, ji aliyê siyasî û leşkerî ve, piştgirî û bêdengiya hêzên navneteweyî, bi taybetî ya Rûsya û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê , rê li ber vê dagirkirinê vekir.

Di 18'ê Adara 2018'an de, piştî berxwedana 58 rojan a ku wekî "Berxwedana Serdemê" tê naskirin, gelê Efrînê ji ber êrişên dijwar ên dewleta Tirk û komên çete bi darê zorê hat koçberkirin û berê xwe da herêma Şehbayê. Ji xwe wekî ku tê zanîn şêniyên resen ên Efrînê bi pirranî Kurd in. Beriya sala 2018'an, rêjeya Kurdan li herêmê ji ji sedî 95 heta 98 bû. Lê belê piştî dagirkirinê û pêvajoya guhertina demografîk, ev rêje li gorî raporên saziyên mafên mirovan, daketiye derdora ji sedî 25 heta 35'an.

Beriya sala 2018'an, Efrîn wekî kantoneke xweser a Kurdan li Rojavayê Kurdistanê bi rêve diçû. Armanca sereke ya dewleta Tirk ji vê dagirkirinê, nehiştina statuya Kurdan li Rojava û pêkanîna guhertina demografîk bû. Tirkiyeyê xwest rê li ber yekbûna kantonên Kurdan (Cizîr, Kobanê û Efrîn) bigire, da ku hîmê herêmeke xweser a Kurdî li ser sînorê wê ava nebe. Dewleta Tirk her çendî bi hincetên "ewlehiya sînor" êriş bir ser Efrînê û herêm dagir kir jî, armancên wê yên bingehîn bi temamî stratejîk û siyasî bûn.

### Rêwîtiya berxwedan û pêlên koçberiya 4 carî

Gelê Efrînê cara destpêkê di sala 2018'an de, ji ber êrişên dewleta Tirk û komên çete bi darê zorê hat koçberkirin. Bi hezaran Efrînî neçar man ku dest ji mal û milkên xwe berdin û berê xwe bidin herêma Şehbayê. Gelê Efrînê 7 salan li Şehbayê di nava dorpêç û êrişan de jiyana xwe berdewam kir.Tevî dîtina her cûre zehmetiyan jî wan li wir jiyaneke nû ava kir; hemû sazî, dezgeh û dibistanên xwe li gorî sîstema Rêveberiya Xweser birêxistin kirin û xizmeta gelê xwe kirin. Di nava van 7 salan de, hêviya vegerê di dilê her koçberekî de her ku diçû mezin dibû, lê belê ev xeyal di nexşerêya nû de veguherîn pêleke din a koçberiyê.

Di 27'ê Mijdara 2024'an de, dema hêzên "Heyat Tehrîr el-Şam" li gundewarê rojavayê Helebê êrişî artêşa Sûriyeyê kirin, komên çete yên girêdayî dewleta Tirk jî li herêmên Ezaz, Mare û Babê dest bi seferberiyê kirin. Armanca wan destpêkirina êrişeke leşkerî ya bi navê "Berbanga Azadiyê" bû li dijî herêma Şehbayê û gundên Şêrawayê, ku bi deh hezaran koçberên Efrînê lê diman. Êrişên giran di sibeha 1'ê Kanûna a 2024'an de ji sê aliyan ve (rojava, bakur û rojhilat) dest pê kirin. Ji bo parastina jiyana sivîlan, di heman rojê de herêm hat valakirin û biryara vekişînê hat girtin. Di vê pêla duyem a koçberiyê de, beşeke mezin a gel berê xwe da herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, beşek jî derbasî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyeyê yên Helebê bû.

Koçberên ku çûbûn Bakur û Rojhilatê Sûriyê li kamp û dibistanên Tebqa û Reqayê bi cih bûn; beşek ji wan jî derbasî herêma Cizîrê bûn. Lê belê, gelê ku derbasî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyeyê bibûn, di nava du taxên biçûk de asê man da ku ji xaka Efrînê nêz be. Piştî ketina rejîma Baas û hatina Hikumeta Demkî ya Sûriyeyê, ev her du tax di nava dorpêçeke giran, kêmbûna sotemeniyê û tunebûna xizmetguzariyê de man. Ji bo parastina sivîlan û çareserkirina krîzê, di 10'ê Adara 2025'an de di navbera Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mazlûm Abdi û Serokê Hikumeta Demkî ya Sûriyê Ahmad Şera de peymanek hat îmzekirin. Paşê, di 1'ê Nîsana 2025'an de peymaneke siyasî û ewlehiyê ya din hat îmzekirin daku Rêveberiya Xweser a taxan û aramiya herêmê di bin sîwana peymanên giştî de bê parastin. Tevî van peymanan jî dorpêç berdewam kir û di 6'ê Çileya 2026'an de, çekdarên Hikumeta Demkî û komên çete bi awayekî hovane êrişî her du taxan kirin. Piştî şerekî giran ê 6 rojan ê di navbera wan û Hêzên Asayîşê de, Hikumeta Demkî peyman binpê kirin. Bi vê yekê, gelê Efrînê yê li van taxan cara sêyemîn bi darê zorê koçber bû û dîsa berê xwe da herêmên Rêveberiya Xweser. Hikumeta Demkî bi êrişên li ser Helebê sînordar nema; bi piştgiriya dewleta Tirk û bêdengiya navneteweyî plana êrişê bir ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê. Di encama van êrişên dijwar de, koçberên Efrînê yên ku li kamp û dibistanên Tebqa û Reqayê diman, li gel gelê Kobanê, Serêkaniyê û koçberên nû yên Şêxmeqsûdê, neçar man ku careke din birevin. Wan berê xwe da kantona Cizîrê û li wir di dibistan, akademî, sazî, mizgeft û baxçeyên zarokan de bi cih bûn. Ev bûyer bû pêla çaran a koçberiyê ku gelê Efrînê di nava 8 salan de, li herêmên cuda û ji ber êrişên cuda re rûbirû man.

### Peymana 29'ê Çileya 2026'an

Li Rojavyê Kurdistanê şerê qirkirin û tunekirin li ser gelê Kurd hate plankirin. Ev êriş ne tenê ji aliyê hikumeta demkî a Sûriyê ve pêk hat, lê belê bi planên dewletên Ewropî û Erebî herwiha bi destekdayîna dewleta Tirk pêk hat. Ji bo vê jî û ji bo parastina gelê Kurd li Rojava û misogerkirina mafê gelê Kurd hevpeymanek di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û hikumeeta demkî a Sûriyê d hate Îmzekirin, yek ji xalên sereke yên vê peymanê vegera bi ewle ya Koçberan bû.

Di çarçoveya pêkanîna vê peymanê de amadekarî ji vegera koçberên Efrînê re hatin kirin ku koma yekem a koçberên Efrînê di 9'ê Adara 2026'an, koma duyemîn di 4'ê Nîsanê, koma sêyemîn di 9'ê Nîsanê, koma 4'emîn, 5'emîn, 6'emîn û 7'emîn d Nîsan û Gulan 2026' an de bû, herwiha di 19'ê Gulana de koçberên Efrînê yên ku li Kobanê diman, Koma 8'emîn di 10'ê Hezîrana de, di heman demê de koma 9'emîn û ya dawî di 16'ê Tîrmeha de ber bi Çiyayê Kurmênc ve rêketin. Hêzayî gotinê ye ku rêwîtiya 8 salan ji koçberiyê di peymana 29'ê Çileyê de bi dawî bû.



Hafiz Ahmet Turhalli

## Bandora hevaltiyê

Gotara Pêxember silavên Xwedê lêbin: „Kesayet li ser baweriya hevalên xwe ye. Ji ber wê sedemê kê/kî bi kêre hevaltiyê dike bira hişyar be.“ (Tirmizî, Zühd, 45; Ebû Dâvûd, Edeb, 16).

Rêhevalî an jî hevaltî bandorê ser kesayetan dike û ev bandor rolekî sereke di jiyana mirov de dilîze. Mirov di bin bandora hawîrdora xwe de dimîne, lê ji nav hawîrdora xwe jî hevaltî û dostî ya herî bi bandore. Dostî û hevlatî bi kêre were danîn, dê ew kesayet li ser rawişt û takekesiya hevalê xwe bandor bike. Bê guman di gerdunê de her tişt, bandorê li derûdora xwe dike. Lê belê weke mirov hebunekî dîtir, ewqas bi bandor tevnagere.

Weke bêhna ku li derûdora xwe bandorê li ser çek û lixwekirinan dike, bêhna hevaltî û dostiyê jî kare li ser kesayetê heval û hogirên xwe, erênî an neyênî bandorkî bihêz bike.

Mînak:

„Em weke kesayet di bazareke masîyan de an jî li cîhê sergoyan bigerin û roja xwe derbas bikin, her çiqas em destê xwe nedin masiyan û sergoyan jî, wê bêhna masî û sergoyan xwe li ser cil û bergên me û laşê me bicih bike.

Em biçin nav kîjan civakê ewê bêjin bêhna masiyan an jî ya sergoyê ji we tê.“

Berovajî vê bêhna baş û xweş jî heman tişte. Ger em biçin, „nava dikkanekî parfun û bêhnfiroş, anjî bexçekî gul, çîçek û sosinan, em ji dikanê bêhnan nekirin û ji bexçê gulan, gul û sosinan jênekin û ser şal û şepikên xwe nedin jî, dê bêhnekî xweş li ser me xwe bicîh bieke.“

Herweha kesayetên cem me rûnên, an jî di ber me re derbas bin dê bêhna xweş ji me bigrin.

Weke vê bêhnê, hevaltî û rêhevaltî jî li ser kesayeta me rolekî berbiçav dileyize.

Ger mirov hevaltiya zaliman, dizan, derewkeran, fesadan, çavneberan, xayinan, qatilan, sînornenasan, çavsoran, xwedî rihê kole û bindestan, nezanan û necamêran bike, dê weke wê bêhnê ev taybetmendî û kesayet, di jiyana me de bicîh bibin. Kesayetên tembel, nezan, xwedî eqlê kole, nebaş, herdem gazinker û xwedan taybetmendiyên xirab, weke hevalan zêde bibin, dê civak jî birize û jihev bikeve. Dema kesayetên li gor eqlê hevbeş, berjewendiyên hevbeş, rawişta hevbeş û paqij zêdebin, dê civak jî zindî bibe û bêhna xweş jê were. Kesayetên zîrek, zana, xwedan menewiyat zêde bibin, dê ew civak, zîrek û bêhn xweş be û dê bala civakên dîtir jî bikşîne.

Xwedê di Qur'an a pîrozde weha ferman dike: „Ji we bira civakekî hebe, bangî mirovan li ser başî û qencîyan bike û ji nebaşî û neqenciyan ji mirovan dur bike. Ew in yênku digîhîjin aramî û kêfxweşîyê.“ (Alî-Îmran 104)

Qur'an dibêje: Xweda me bike hevalê, kesên alîkariya mezlûman dikin, hevkariya feqîran dikin, destê bindestan digrin, zîrekin, karên biwate dikin, avakerin û jiyana xwe di avakirinan de dibuhurînin.

Dema ku em neha tê de dijîn, hevalên baş herdiçin kêm dibin û bêhna nebaşiyê zêde dibe.

Desthelatdar bi dizî, talan, derew û xapandinê ve kar dikin. Zêdetirên civaka îro, ji bo hevaltî û hevkariya desthelatdarên neqenc bidest bixin, bi pêşbirkê hevûdu dipelêxin.

Li gor çîrokekî desthelatdarekî navê wî deccal heye:Ew millet bi pere û berjewendiyan dixapîne, ji rastiyan dûr dike û wan ji rê derdixîne. Kê bibe hevalê wî dibe ehlê dojehê. Hevaltiya wê jî tenê ser berjewendiyane. Hevalên Deccal her diçin zêde dibin, lê deriyê dojehêjî vedibin. Nebin hevalê Deccalan, bibin hevalên kesên baş.